

ARMANC
Ji mehê
carekê
dertê
Hejmar: 120
Îlon
1991
Buha: 15 Skr.
3 DM

Armanac

SERXWEBÛN DEMOKRASÎ SOSYALÎZM

ARMANC
Monthly
Kurdish
Magazine
No: 120
September
1991
Price: 15 Skr.
3 DM

Di hilbijartinê de HEP bi SHP'ê re

□ Di hilbijartinê de HEP'ê bi SHP'ê re "itifaq" kir.

□ Hin rêxistinên wîlayet û qezayên Kurdistanê yên Partiya Refahê li hember itifaqa di navbera Refah û partiya faşist MÇP'ê de derketin û her ji bo wê yekê ji Refahê veqetiyên.

Ev e du sal û niv e ku muxalefeta hukûmeta ANAP'ê daxwaza hilbijartinên giştî yê awarte dike. Partiya ANAP, ji bo ku hîn pirtir deng wenda neke piştî kongra xwe bi serokê xwe yê nuh Mesut Yilmaz biryara hilbijartinê girt. Li gor biryarê, hilbijartin



Gelo çûn zeyîtiyê û wê nema vegezin? Parlamenterên Kurd du sal berê ji bo ku beşdarî Konferansa Kurd a Parîsê bûbûn ji SHP'ê hatibû qewirandin. Wan ji HEP avakiribûn. Nuha ji bo ku cardin bên hilbijartin çûn ketin SHP'ê. Encam: Gelo çûn zeyîtiyê û wê nema venegerin?

Dûmahîk r. 11

Gerrek li nav şêreberîndarên warwêran

Bi hêvî û endîşên mezin me gavên xwe avêtin axa rizgarkirî



"Di 1'ê Tirmehê de em, di kelekela germa nivro ya havînê de bi kelekê ji çemê Dîclê derbas dibin û piyên xwe davêjin ser axa Kurdistanê Iraqê. Li vî alî meqerên pêşmergan li ser hidûd, li ber devê çem in. Em hinekî li wir bîhna xwe vedidin. Firavîna pêşmergan masî ne ku nuh ji çem hatine girtin. Em jî dibin şirikên firavîna wan." (Foto: Armanac)

Murad Ciwan bi vê reportaja xwe ya dirêj wê we xwendevanên me li Kurdistanê Iraqê bigerîne! rûpel: 6-7-8

Yekîtiya Sovyet:

Sîstem têkçû, yekîtî şik jê heye

□□ Gorbaçov: "Modela ku me bi kar anî bi ser neket. Di wê baweriyê de me ku ev biserneketina ne ji bo me tenê, wê ji bo herkesî bibe ders".

□□ Yeltsîn: "Komunîzm li gel xweşbûna xwe fikreke utopîk e. Tecrûbên ku em dijîn, trajediya dawî ya îdeala xweşbûnê ne".

Piştî darbeya biserneketî ya 19'ê Tebaxê sîstema Yekîtiya Sovyet bi lez ber bi guhertinê ve diçe. Ji bo ku Partiya Kômunist ya Yekîtiya Sovyet li hember derbê bêdeng ma, li gelek komaran faalîyetên wê hat sekinandin û wê neqanûnî îlan kirin. Di 5'ê Îlonê de ji Kongreya Nûnerên Xelkê (Meclîsa Bilind) qerar stend ku peyman yekîtiyê ya ku di sala 1920'an de di navbera komarên Sovyetê de çêbûbû û bi navê Yekîtiya Komarên Sovyet ên Sosyalîst dihat bi nav kirin, fesh kirin. Heta ku peymanek nuh di navbera komaran de îmze bibe wê Konseya Dewletê berpirsiyarê pirs û pirsgerê hundur û derveyî welêt bigre ser milê xwe. Ev Konseya Dewletê ji 10 serokkomarên cumhuriyetên Sovyetê pêk tê. Moldaviya û Gurcîstan di Konseya Dewletê de cih nestandin. Ji xwe di pratîkê de heta nuha 11 komarên Sovyetê di parlamentoya xwe de qerara serxwebûna xwe standine. Lê ne dewleta merkezi ya Sovyet û ne jî tu dewletên cihanê heta nuha ew nasnekirine.

Konseya Dewletê di civîna xwe ya yekem de tenê bi resmî serxwebûna Letonya, Estonya û Litvanyayê nas kir. Ev sê dewlet jî alî gelek dewletên cihanê ve jî bi resmî hatin naskirin. Û ev sê

Dûmahîk r. 11

Rojeva Mehê

Kurd ji taktîkeki millî bêpar dikevin hilbijartinan

Li Tirkîyê di 20'ê meha Çirîya Pêşin de hilbijartinên giştî çêdibin, ji bo parlamentoya Tirkîyê wê endamên nuh bîn hilbijartin. Esas hilbijartin wê hîn piştî salekê bihatana çekirin, lê li ser daxwaza partiya li ser hukûm, parlamentoyê salek ew pêş de xistin.

Her çiqas demokrasiyek rastin li Tirkîyê bicîh nebûye jî, hebûna pirpartîtiyê û di hukûmet û qanûndanîne de rola parlamentoyê girîngiyekê didin hilbijartinan û di demên hilbijartinan de nebûye jiyana siyasî bilindtir dibe. Hissiyeta hilbijêran li hember buyerên siyasê û civakî hesastir dibe. Loma herçî Kurd li ser navê şexsiyeta xwe ya millî di hilbijartinan de beşdar nabin jî girîngiyek hetta derecê didin wan.

Karakterki taybetî yê ve hilbijartinê heye. Di tarîxa Tirkîyê de cara pêşin e ku ne di warê qanûnî lê di fiiliyatê de Kurdbûn, pîrsa Kurdî, mewqûfê Kurdayetiye û şexsiyeta millî ya Kurd bi vî awayî êşkere û berfireh cih digre. Ev yek, mecbûr dîke ku partiye Tirk çî li ser hukûm bin çî li muxalefetê, çî rast bin çî çep; hemû bi başî yan xerabî siyaseta xwe li hember Kurdîtiyê diyar bikin.

Lê tevî her tiştî, rastiyek jî di van hilbijartinan de heye ku meriv pê dîşikestî dibe. Ew jî tunebûna taktîkeki muşterek e millî di nav Kurdan de ye. Kurd jî taktîkeki millî yê muşterek bêpar diçin hilbijartinan.

Berî biryarderxistina li ser tarîxa hilbijartinan qenaetek wiha li nav piraniya Kurdan hebû ku HEP wê karibe rolekê bilîze ku di hilbijartinan de Kurd li ser mewqûf û daxwazên xwe yê millî bigihîjin hev û hebûna xwe ya millî raste rast di hilbijartinan de û piştî re jî di parlamentoyê de derxin ber çavan. Biserketinek wiha di jiyana siyasî ya parlamentariyê a Tirkîyê de wê qonaxêke nuh destpê bikira. Kurd wê edî terefek, yan jî a rasttir hebûnek serbixwe bûna di ve jiyane de.

Lê nebû. Di nebûnê de helbet roleka partiye Tirk ên parlamentoyê heye. Gava biryar li ser pêşdexistina hilbijartinan dan, kombinezon bi wî awayî li hev anîn ku HEP nikaribe têkeve hilbijartinan. Wan imkana bikaranîna wasitayek wek HEP'ê di hilbijartinan de ji destê Kurdan derxistin. Vê yekê di jiyariyê li ber tespîtkirina taktîkeki millî yê muşterek peyda kir.

Ji alî din, Kurdan bi xwe jî tu girîngî nêdan hebûna taktîkeki wiha. Rewşa Kurdan, a jî eqliyet û muestestiya millî bêpar, bi wan nêda fikrandin ku ya herî muhîm ne ew e ku emê çawa herin parlamentoyê, lê ew e ku emê ji bo çî, bi çî daxwazan herin parlamentoyê. Berî ku bê tespîtkirin jî bo çîye, munaqesha wê yekê destpêkir ku gelo em bi partiyeke re itîfaq bikin yan namzedên serbixwe derxin. Piştî ku mesela "ji bo çî" bi muşterekî nehatibû diyarkirin û qebûlkirin, lihevhatin li ser mesela "bi çî awayî" jî biserket. Hîn çûn bi SHP'ê re lihev hatin, hînan namzedên şexsiyên serbixwe danîn û hîn jî di hîn partiye din ên Tirk de cih girtin. Di vî netîcê de, jî delva mewqîfêki millî yê Kurdîtiyê, hebûna tengbînî, kurtbînî û menfeetperestiya şexsî, herêmî, malbatî, yan jî îdeolojîya sekterî rol leyist. Mixabin carek din diyar dibe ku hê jî me re gelek divê heta diyardeyên mîletbûnek hemdemî di me de gulvedin.

Ji Xwendevana re;

Carna hin xwendevanên me nivîsên xwe yê çapnebûyî paşde dixwazin. Li vir bi izna we em dixwazin carek din bidin diyarkirin ku nivîsên jî redaksiyonê re tî paşde nayên vegeandin.

Em hevî dikin ku hun li me negirin.

Hilbijartin, HEP û polîtîka Kurd

Mîrza Bextiyar

Di 20'ê Çirîya Pêşin de li Tirkîyê hilbijartin giştî çêdibe. Partiya li ser hukûm -ANAP-, piştî kongreya xwe, bi serokê xwe yê nuh hilbijarti xwest îmajek nuh bide gel, hîn ku ew jî "kevin" nebûye, bi qerarekê jî nişka ve biryara hilbijartinê stend. Li gor biryarê, hilbijartinan ku sala bê wê çêbibûya, wê îsal çêbibe.

Dema biryara hilbijartinê hat stendin, serokê ANAP'ê û serokwezîrê Tirkîyê Mesut Yılmaz bi partiya Suleyman Demirel DYP û partiya Erdal İnonu SHP'ê re rûnişt, li ser awa û şekî hilbijartinê li hev kir. Li gor vî lihevkerinê, rê li HEP'ê (Partiya Ked a Gel) girtin da ku ew nekeve hilbijartinê.

Sedemên esasi yê pêşilêgirtina HEP'ê ne veşartîne, êşkere ne. Roja ew kesên Tirk ku di damezirandina HEP'ê de beşdar bûbûn, yek bi yek jê îstîfakirin û HEP jî Kurda re ma, dewleta Tirk dest pê kir êrîş bir ser HEP'ê. Bi şîara "yegirtina dewleta Tirk" û "yekîtiya netewa Tirk" hemû partiye derxistin; Suleyman Demirelê "demokrasixwaz", Erdal İnonuyê "sosyaldemokrat", Erbakanê "Musulman", Turkeşê faşist û nemaze dijminê gelê Kurd, Ecevitê nijadperest, li hember van êrîşên ku dewletê dibir ser HEP'ê, bêyî bédengmayineke bi kêfxweşî, tu reaksiyon nişan nêdan. Hetta carcaran bi awakî vekirî piştigirîya van êrîşan kirin.

Îsal, piştî xwepêşandanên gelê Kurd yê li bajarên, êrîşên dewletê li ser HEP'ê seçar qat zêde bûn. Di meha Hezîran û Tirmehê de berpirsîyê HEP'ê hatin girtin, ji malên xwe hatin revandin, li serê kuçan hatin gulebarankirin û bûn hedefên êrîşên bomban. Di van êrîşan de serokê HEP'a Diyarbekir Vedat Aydın, endamê HEP'ê Remzi İI, endamê komîta rêvebir a HEP'a Tatwa-

nê Sadrettin Akkaya hatin kuştin. Di cenazê Vedat Aydın de li gor reqemên resmî 7 kes hatin kuştin, bi dehan kes hatin birîndarkirin. Di nav birîndaran de parlementerên HEP'ê jî hebûn. Polisên dewletê bi zanîn parlementer dan ber copan.

Piştî van êrîşan, gelek êşkere bû ku dewlet wê rê li ber HEP'ê bigre ku wek partî nekeve hilbijartinê. Heta ew şik bi me re çêbûbû ku dewlet HEP'ê bigre jî.

Heger HEP beşdarî hilbijartinê bibûya siyaseta Kurdan ya muşterek karibû bi hêsani derketa. Lê îro Kurd divê polîtîkayek çewa bajon? Di bersiva vî pîrsê de awirên Kurdan li ser HEP'ê kom bûn. Gelo wê HEP'ê siyasetek çewa bida ber xwe? Li herêmên Kurdistanê wê namzetên serbixwe derxe, hilbijartinê protesto bike an jî bi partiyeke re itîfaq bike?

HEP'ê rabû riya herî neçê da ber xwe. Bi SHP'ê re li hev kir. Ev gav him jî alî exlakî û him jî alî siyasî ve gaveke xirab bû. Ji aliyê exlaqî ve, yek, SHP jî wan partiye derxistin yek e ku bi navê "yekîti û yegirtina dewleta Tirk" di şerê li hember gelê Kurd de teref e. Dudu, ji xwe HEP jî alî wan parlementerên ku beşdarî Konferansa Kurd a Parisê bûbûn û jî ber vî yekê jî jî SHP'ê hatibûn îxracirin hatibû avakirin. İcar, ew HEP rabe bi vî SHP'ê re itîfaqê çêke û jî xelkê Kurd deng (ray) bixwaze!...

Ji aliyê siyasî ve li hesabê meriv bê û li gor menfeeta meriv a millî û siyasî be, mirov dikare bi partiyeke ku jî alî exlaqî ve jî neçê be, ji bo demek kin û diyar itîfaq bike. Lê mirov dema li rewşa welat mêze dîke, ev itîfaq HEP û SHP'ê ne li gor menfeetên millî û siyasî yê Kurdan e. İro li Kurdistanê şiyarbûna netewî pêl daye. Li bajar û gundên Kurdistanê li hember zulm û zordariya dijmin tevgerên girseyî çêdibin.

Esnafe, xwendevan, karkir, gundî bi dikangirtin, boykot, meş û bi tevgerên cûr bi cûr dengê xwe bilind dikin. Tesîra partiye derxistinê li Kurdistanê dişkê û jî qewet dikeve. Êdî gel, hududek xistiye navbera xwe û partiye derxistinê. Di rewşek weha de jî bo bidestxistina çend kursiyên zêde yê parlamentoyê, itîfaqê bi SHP'ê re polîtîkayek çewt e û zerareke mezin wê bigihîne huviyeta siyaseta serbixwe ya Kurdî.

Li vir pîrsa "polîtîkayekê çawa" dertê holê. Bi a min polîtîkaya rastirîn li hemû bajarên Kurdistanê derxistina namzetên serbixwe bû. Dibû ku Kurdan li gor hêza xwe hindiktir parlementer derxistana, lê wê hejmarek mezin deng bigirtana û di kampanya hilbijartinê de atmosfera polîtîkê wê hîn bilindtir û hudûdê di navbera polîtîka Kurd û partiye derxistinê jî kurtir bikira. Ev jî her tiştî girîngtir e. Mesela zêdetir parlementer derxistin jî girîng e, lê ew di dereca dudiyar de tê.

Lê HEP'ê mesela zêdetir parlementer derxistinê jî her tiştî girîngtir dît. Ev jî êşkere ye ku HEP tîketa hilbijartinê jî wê jî sedî deh deng negirta. Ewên ku jî bo zêdetir parlementer derxin bi SHP'ê re itîfaqê dîkin, diviya di şertên ku HEP bikaribûna beşdarî hilbijartinê bibe jî HEP'ê nekirina hilbijartinê û bi SHP'ê re itîfaq bikirana. Dewlet dizane HEP tîketa hilbijartinê jî li temamiya Tirkîyê û Kurdistanê wê jî sedî 10 deng negrin. Tiştê ku dewletê ditirsîne dîrketina Kurdan jî partiye derxistinê û xurtbûna polîtîkayekê Kurd a serbixwe ye. Ji ber vî yekê dewletê nehişt HEP tîketa hilbijartinê. HEP'ê jî bi vî itîfaqê dilê dewletê hînik kir.

Tiştêki din e xerab ew e ku di vî hilbijartinê de jî welatparêzên Kurd nebûn xwedî polîtîkayekê muşterek.

Kurd beşdarî festîvalê Skotlandê bûn

Her sal li Skotlandê, li bajarê Glasgoyê festîvaleke mezin ya hunerî pêk-tê, ku di festîvalê de gelek dengbêj û hunermendên bi nav û deng beşdar dibin. Di festîvala îsal de ku di dawîya meha Tebaxê de pêk hat, cihekî taybetî jî bo Kurdan terxan kirin.

Ev cara yekem e ku Kurd beşdarî vî festîvalê dibin.

Li Tokoyê haziriya Melbenda Kurdî

Piştî felaketa dawî ya li Kurdistana Iraqê bi ser gelê me de hat piştigiriyek mezin li seranserê cihanê jî bo mesela Kurd dest pê kir. Çend Japoniyên dostên Kurdan pêwendî bi Melbenda Kurd li İngilistanê re danîn, ji bo ku ew karibin melbendeke Kurd li Japonayê vekin ku bi vî riyê karibin diroka Kurd û tîkoşîna wî ya jî bo mafên neteweyî bi raya giştî ya Japon re bidin nasîn.

Redaksiyon: M. Elî, Zinarê Xamo, Hesen Mîzgin, Mîrza Bextiyar, Lewend Firat, S. Rêving
Redaktorê berpirsîyar: M. Elî
Berpirsîyarê beşê Dimilki: Mahmûsanij

Adres: Armanç
P. Box: 152 16
161 15 Bromma
Sweden

Telefon: 46-8-803135
Telefax: 46-8-801825

Anevarîgutgîvare:
Kurdîska Demokratîska
Arbetar Unîona
Postbox: 50 37 90-0
ISSN: 0345 7385

Kampa Holê

NEYNİK *Bavê Nazê*

Balans

Wekî nas e, sê beşên dinyaya me av e û beşek jê bej e. Li gor lêkolînên mexberî sê par ji laşê însan rohn e û behrek ne rohn e. Gelo ev xisletên di laşê însan de û yên di xweristê de lêhatin in? Eger em mirov xwe parçeyek ji xweristê bibînin, divê em bibêjin :na, ne lêhatin in. Bi rastî jî carna mirov çî di xweristê de, çî di civakê de pêrgî tiştên weha seyr tê ku, dibin sedem ku mirov hezar pirs û pirsêkê ji xwe bike û ji bo wan li ravekirinê bigere.

Pirî caran dema çavê mirov li tişt an kesên kirêt ku ziyar ji wan tê, dikeve, mirov ji xwe dipirse: "Ji bo çî ev hatine ser rûyê erdê û mana wan çî ye?" Mirovê bawermend bi awakî din pirsar xwe dike: "Ma Xwedê çîma ev mexlûqên ku ziyar ji wan çêdibe, xuliqandin e?" Dibe ku ji ber bawermendiya xwe pêre pêre ji gotina xwe vegere û bibêje: "Estexfrullah. Madem Xwedê ew çêkirine, mana xwe ihtiyac bi wan heye û çawa be Xwedê bêtir bi karê xwe dizane."

Di vî warî de mirovê alim yan ilmî bi awakî din gotina xwe dajo: "Heger sebeb heye, divê musebib ji hebe." Bi gotineke din, tiştêkî zêde di xweristê de tune ye û xwerist li gora qanûnên xwe digere...

Li gora van gotinan em dibînin ku bi mefhumê dinî her tişt bi îrada Xwedê ve girêdayî ye û ji aliye mirovê dinyayî ve jî ev tişt bi riya qanûnên xweristê tên ravekirin. Êdî bi vî yekê divê em destên xwe deynin ser hev û tu karî nekin, dêmek her tişt di çerxa xwe de digere û bi îrada yê li jor ve girêdayî ye? Mana xwe guhertin ne pêwîst in? Bi xwe mebest ji gotinê ev e: xebat û guhertin pêwîst in, lê bi vî yekê divê ji encama xebatê zirar ne-gihîjin qanûnên giştî...Erê pêwîst e ku destdirêjîya qanûnên giştî -çî yên xweristê, çî yên civakî- neyê kirin. Li gel ku qanûnên xweristê efwî ne û yên civakî bi îrada mirovan in, her ew bi awakî giştî li hev dikin. De emê nimûmekê ji xweristê û yekê jî ji civatê bînin:

Herêmek fireh bi daristanan xemilandîye. Cewê (hewa) wê havînan hênîk û xweş e. Heger ew daristan bêne rakirin, piştî qonaxêke dîrokî, ew ciyê ku rojek ji rojan bi daristan bû, dibe berî û cewê wê tê guhertin û nexweş dibe û ne dîr e ewê nema bi kêrî jiyana insan bê.

Helbet tiştêkî diyar e ku em ji civaka milletekî, zana û ronakbîrên wî rakin, ewê bi her tiştê xwe bi dehan sal li paş bimîne.

Erê rengên her du nimûnên me ne wek hev in, lê bi cewherên xwe yek in. Ji xwe di warê tewazinê de zahîrên xweristê û yên civakê pir nêzî hev in. Nimûna şerê çûkên beytik li Çînê û yên guran li Sovyetê nimûnê ber bi çav in û ne ji mêj ve ne. Di salên '60 î de hukûmeta Çînê îlana şerê çûkan kir. Li gor nêrîna wê, çûk pir bûbûn û ziyar digihandin çandîna welat. Lê belê piştî ku çûkên beytik li Çînê pir kêr bûn, heşerat wilo pir bûn: ku êdî ziyana gihişt zad û baxan bi deh qatan ji ya çûkan zêdetir bû. Îca Çînê ji neçarî ji welatên din dest bi kirîna çûkan kir.

Ev nimûne çîlo di xweristê de pir in, wilo di civaka me de jî pir in. Ma gelo ji civakê rakirina çînekê ne rengêk e ji rengên ketîna balansa di civakê de ye? Li gel ku ev tiştêkî li ber çava ye, lê di heyama gurbûna xebata çînî û şoreşgerî de bi awakî vekirî pirsar qirkirina çînê sermayedar û derebegan dihat dayîn û mixabin heya niha jî di nav Kurdan de tesfîya hêzekê ji aliye hêzeke din ve bi rehetî tê ser zimên.

Gelo çîma ev tişt dibe? Gelo ji ber nezanîne ye? Heger di nav şoreşgerên Kurdan de çewtî û şaşî ji ber nezanîne dihat û tê, lê di nav yên cihanê de ev xebata kambax û wêrankirîne li ser bîngeheke ilmî dibû. Li gor meqûla (kategorî) diyalektîkî, dijîtî li hember dijîtîyê bîngehê pêşketîne ye... Pêla ew pirs dibû: di civaka bêçîn de wê dijîtî li hember kê be? Dîsa bi rehetî dihat gotin: êdî wê dijîtî li hember xweristê berdewan be û ji bo bindestxistina wê, dawî ji xebatê re nayê. Lê wan di vî pirsê de ji bîr dikirin ku liberxwedana xweristê pasîf e û tê de kamin e. Hiç nedihat hişê wan ku dijîtîya di navbera hêzan de li ser îktîşafa xweristê wê ya herî faal be.

Mirov tu car qebûl nake ku baxê wî bi mîwekê be û ji heywanên dinyayê, tenê celebek hebe. Ew xwe bi kuştin dide ku îdeolojîyek bi ser keve. Lê tiştê seyr ew e ku mirov bi xwe jî xebatê dike ku ji cinsê wî celebek tenê hebe. Ew xwe bi kuştin dide ku bi tenê dînek hebe. Ew vî xebatê ji bo civaka yekrengî dike, li gel ku wê sistemek weha bêçêj be û dîrî aqila be.

Gelo çîma mirov çîqûliya dara di bin xwe de dibire? Ma ne ye ku dara di bin xwe de birfû hov û dehbe bû.



Em xwedî mal bûn, xwedî ax bûn, xwedî keriyê pez bûn. Lê nuha... (Foto: Armanç)

(Agirîn Amûdî - Heseke)

Kampa Hol 10-15 km. li rojhilatê Heseke ye. Salek berê hatîye avakirin. Kamp di destpêka krîza Xalîcê de ji alî Netewên Yekbûyî ve ji bo penaberên ku ji Iraqê dihatin, hat avakirin.

Nuha li dor 80 malbatên Kurd li kampê dijîn. Rewşa kampê gelek xerab e; Ava paqij tune ye, ava

şor vedixun, zarok tazî ne, pêxwas in.

Normal ji bo kesên ku li kampê dijîn, Netewên Yekbûyî pere, xwarin û cil dişînin. Lê kesên ku îdara kampê dikin, eşyayê tîn, belav nakin, tiştêkî pir kêr didin wan. Lê meriv dikare li sûkê(çarşî) eşyayên ji alî Netewên Yekbûyî hatine şandin, ku li serê nivîsîne "ne ji bo firotinê ne",

bibîne.

Li kampê jineke navsale ji min re digot: "Ev saleke min e ku li vir im, pariyek goşt neketiye devê min"

Li kampê alîkariya sihhî ji gelek kêr e. Hefîte carekê doktor kampê ziyaret dike, lê ji kêmasiya dermanan pêşî li nexweşiyên nayê girtin.

□

Encama Hilbijartinên Swêd:

Partiyên çep wenda kir, yên rast jî bi ser neketin

Di roja 16. 9. 1991'ê de li Swêdê hilbijartina parlamento, belediye û ya wilayetê çêbû. Partiyên çep; SAP (Sosyal Demokrat) û VP (Partiya Çep) bi hev re 23 parlamenter wenda kirin. SAP 138 û VP jî 16 parlamenter derxistin. Partiya Gel a Liberalan (FP) û Partiya Merkez (C) jî her yek 11 parlamenter wenda kirin. Partiya Muhafazakar (M) 15, Civata Demokratîk a Fileyan (KDS) 26 û Demokrasiya Nu (NYD) 24 parlamenter derxistin. Parvekirina ciyên parlamentoyê wiha ye:

- SAP 138 (-18)
- VP 16 (-5)
- M 81 (+15)
- FP 33 (-11)
- C 31 (-11)
- KDS 26 (+26)
- Nyd 24 (+24)
- MP 0 (-20)

Partiya Hawîrdor (MP) ji ber ku baraja %4 di tevayîya welêt de

derbas nekir, 20 parlamenterên xwe wenda kirin û ji parlamentoyê dîr ket.

Netîca hilbijartinê ji bo partiyên çep hezîmet û ji bo partiyên burjuva jî serkeftinek dîrokî bû. Partiyên çep ne tenê di hilbijartina parlamentoyê de, lê di hilbijartinên belediye û wilayetê de jî desthilata xwe wenda kirin. Meclîsên bajarên mezin wek Stockholm, Uppsala, Goteborg û Malmö'yê ketin destê partiyên burjuva.

Musulmanekî Kurd di lista partiya fileyan de

Xusûsiyetek vî hilbijartinê sala 1991'ê ya Swêdê heye ku biyaniyan jî îsal bi xurtî di lista partiyên siyasî de ciyê girtin. Partiyên ku di lista xwe de çî dabin biyaniya SAP, VP, FP, M, C û KDS bûn. Di vî warî de ya herî balkêş beşdarbûna misilmanekî di lista KDS'ê de bû. Navê vî misilmanî **Fahad Abdî Aglebûb** e û ji Kurdistanê Îranê

ye. Ji bilî wî, ji bo belediya Uppsalayê di lista VP'ê de 2, di ya SAP'ê de Kurdan namzetîya xwe nîşan dabûn, ji bo Belediye Botkyrka di lista VP'ê de 1, li belediya Hanîngeyê, yek di lista SAP'ê, yek jî di lista FP du Kurdan namzetîya xwe nîşandabûn. Li belediyan din yên Swêdê, Kurd û hemwelatîyên me Suryanî û Asûrî namzetîya xwe nîşan dabûn. Li gor agahdariyên me ji van namzetan bes, Şerefxan Cizîrî di lista VP da ji bo endamtiya meclîsa belediya Botkyrkayê hat hilbijartin.

■ Du hefte berî hilbijartinên Swêd, li Norwêçê jî hilbijartinên giştî û herêmi çêbûn. Di hilbijartinan de 2 Kurd endamtiya meclîsa belediye bi dest xistin. Rojnamevan Ahmet Bozgîl di lista Partiya Sosyalîst de endamtiya meclîsa Stavenger, Saîd Hecî jî di lista eynî partiye de endamtiya meclîsa bajarê Trondheimê qezenc kir.

Bi kuştina Kurdan terorîst dizên

Elena Bonner*

14'ê Nisanê me di televîzyona Sovyetî de, Saddam Husên, li bajarê Kurdan li Erbilê li ser nimêjê dît. Wî hemdê çek û leşkerê xwe dikir. Êdî yê serketî dîktatorê Bexdayê bû, ne hêzên mutefîkan bûn. Gotineke rastiyê heye, li gora wê; general bi ser dikevin û diplomat ji serketina wan tîk dibin. Ev rastiya ha careke din, bi awayekî vekirî û tazi diyar bû. Lê dîsa di bin doktrîna 'li dijî destdirêjîya mafên hundir yên dewleta serbixwe' de hate nixumandin. Ev tê wê manê ku ew berfa spî ya li ser kopên çiyayê Hîmalaya ku bi teniya neftê reş bûye û Xelica Farisî ku di bin merşên neftê de dimire, bi pîrsa hundirê welatekî ve girêdayî ye. Û li gora vê doktrîne du milyonên ku ji serma û birçbûnê, li çiyayên di navbera Iraq û Tirkîyê de li ber mirîne ne, ew ji ji pîrsa hundir tene hesabandin. Her wiha milyonê Kurd, ji ber parastina jiyana xwe, mişextî Îranê bûne, ev ji ji wê doktrîne ne.

Gelo qirçirina (jenosida) miletekî bi pîrsa hundir ve girêdayî ye? Heger wiha be, vega divê em bi çavekî din li diroke binêrin. Diyar e mîna bêhişîya Mankurtî(1) bi me re çêbûye. Me pênc milyon mişextên Efganî û milyonê kuştî yên li Afganîstanê ji bir kirine. Ma gelo ev pîrsa hundir ya kijan welatî ye? Ev bi pîrsa hundir a Sovyetê ve ye yan ji bi Efganîstanê ve girêdayî ye? Yan ji pîrsa hundir a Pakîstanê ye? Dûxana Osvensiyumê û xwîna li ser diwarên Muabitê (2) ew jî, ji pîrsa hundir ya welatekî ye? Gelo mayîna rejîmek bi gidret peydabûyî, di hundirê re 12 salkokan de, ji pîrsên şexsî ne? Kolîma, Borkota, Katîn(3) û gelên surgûnbûyî ji pîrsa hundir ya Sovyetê ne? Gelo di sala 1915'an de qirçirina gelên Kurd û Ermenî ji ji pîrsa hundirî ya Împaratoriya Osmanî bû?

Heger wiha be, êdî ew deh hezar jin, zarok û kalên Kurdan ku di sala 1988'an de bi jehra kîmyayî hatin kuştin û zêdeyî du hezar gundên wan bi destên leşkerên dostên Sovyetê ên kevin, ji ser rûyê erdê hatin rakirin, ew jî îro dikarin bêne ji bir kirin.

Polîtîkayên muteber û serokên dewletan bi her awayî dixwazin giringiya neheqîya 'destdirêjîya mafên hundir ên welatê serbixwe', îspat bikin. Ew bi vê meqûlê digrin beyî ku bi argûmentên xwe yên listîkî (temsîlî) bihesin. Di eynî wextê de, li ber çavên hemû miletên cihanê(bi riya televîzyonê) bi hezaran zarok li ser destên dayîkên ku ji ber mûsîbeta aqî-

lên xwe berdane, dimirin. Ew doza siyasî ku Iraq wek dewletek yekbûyî bimîne, dikin. Gelo ev ne ji bo parastina sûka bazirganiya çeka ye? Yan ji bo ku Iraq bibe Lubnaneke din? Ma hejmara kuştîyan di ehdê partiya Husên de, ji mêj ve bi ser hejmara kuştîyên Lubnanê neketine? Hîn di ser de ji dibêjin; nabe Tirkîyeya hevalbenda NATO bi avakirina dewletek Kurdî bête xeyidandin. Heger hat û Kurdên wê jî, ji nişka ve doza serxwebûnê bikin? Vêga peymanî Ewrûpî ya ku welatên endamên NATO

Ez bûm şahidê / iftûgoyekê di navbera du / şfên serokên Kurdan de. Nîşfê ciwan dixwest îbat bike ku dem dema metoda terorîzmê ye... Bi vê yekê, êdî Netewên Yekbûyî wê bi çavekî ciddî li pîrsa Kurdî binêre. Ew bangên ji bo aştiyê nabihîzin. Lê Mustefa Barzanî yê hekim, ji wan re digot ku doza Kurdan, dozeke adil e û metodên xebatan ji divê adil bin. Her tim, min didît ku heq bi wî re bû. Lê îro: na û carekê din na. Ez dibêjim pêwîst e bi teqîna bombeyan guhên kesên ku siyaseta cihanê di destên wan de ne, bêne şuştin û çavên wan bêne firikandin.

imza xwe avêtinê binî, çawa tê fam kirin? Tê wê manê ku pîrsa mafên çarenûsî, tenê ji bo gelên Ewrûpî ne? Ku wiha be, êdî ew xwe ji tiyatroya unsuriyetê ya Nasyonal sosyalîstiyê, ku bi wê Silavani dibûn sinifên duyem, Cihû û Qereçî diman ji bo qirçirînê, çetir e?

Îro tiştê ku bi serê Kurdan de tê ji bo Netewên Yekbûyî 'ar û şerm e. Ev îflasa wê ya exlaqî ye. Berpirsiyariya mezin a vî tiştî dikeve ser milên dewletên endamên dayimî yên Meclîsa Ewlekariyê. Bi dayîna mandatê ji bo hêzên mutefîkan, da ku krîza Xelîcê bi riya şer çareser bibe, divyabû di eynî wextê de, Netewên Yekbûyî parastina jiyana rûniştvanên Iraqê; Ereben Şiî û ya Kurdan ji bidana ser milên xwe. Diviyabû wan mûhaweletên gelên Iraqê ji bo rizgarbûna ji bin nîrê rejîma dîktator, bigirtana ber çavan. Divê ku Netewên Yekbûyî, ew yeko yeko li hemberî heza çekdarî ya Iraqî -ew hêza ku ne bîyî alîkariya hin dewletên endam çêbûbû, - nehiştana. Ev yek û ya duyem Netewên Yekbûyî ku bi xwe îlana beyana mafên mirovatî kiriye û li gora giyan û gewdê ve beyanê, qirçirina gelan nabe ji pîrsa hundirî ya kijan welatî dibe,

bila bibe, bête hejmartin. Qirçirina Şiîya li başûrê Iraqê û qirçirina Kurdan li bakûrê Iraqê, nabe bi alîkariya mirovî; bi sindoqên xwarinê, bi betanî û bi avakirina kampên li Tirkîyê û li Îranê, bête çareser kirin.

Divê Kurd li ser wê axa ku dema berê Miladê li ser dijiyan, bijin. Tu munaqaşên pragmatîk, nabe ji bo qirçirina miletekî 30 milyonî re bin bingeh. Û ew kesên ku ji wan bifilitin, bibin mişextên (mahçirên) dayimî; îro Kurdên Iraqê, sibe yên Tirkîyê û ya dinî rojê Kurdên Îranê û yên Yekîtiya Sovyetê. Ji xwe li nik me piraniya Kurdan hîn ji heyamê Stalin bûne mişext.

Büyerek ji mêjve ye, lê belê heya niha tê bîra min. Carekê ez li bin siya şînkaya dareke nêzî bajarê Kurdî Suleymaniyê, rûniştibûm. Ez bûm şahidê guftûgoyekê di navbera du nişfên serokên Kurdan de. Nîşfê ciwan dixwest îbat bike ku dem dema metoda terorîzmê ye. Wan digot, divê keştî û balafir bêne teqandin. Û bombe bikevin makinên diplomatîtan û her wiha ji pêwîst e rehîne bêne girtin. Bi vê yekê, êdî Netewên Yekbûyî wê bi çavekî ciddî li pîrsa Kurdî binêre. Ew, bangên ji bo aştiyê nabihîze. Lê Mustefa Barzanî yê hekim, ji wan re digot ku doza Kurdan, dozeke adil e û metodên xebatan ji divê adil bin. Her tim, min didît ku heq bi wî re bû. Lê îro: na û carekê din na. Ez dibêjim pêwîst e bi teqîna bombeyan guhên kesên ku siyaseta cihanê di destên wan de ne, bêne şuştin û çavên wan bêne firikandin. Û ez di-tirsim ku pêleke nuh ya terorîzmê wê bi ser cihanê de bê. Emê vê yekê bibînin. Lê gelo Netewên Yekbûyî wê tenfîza bi-ryarên ku ji bo vegeza xesaretê û nefirota çekan ji Seddam Husên re, bibîne? Bi xwe ev gelekî bi şîk e.

(*) Elena Bonner xanima Andrey Saxarov e.

1- Di heyama kevn de, dema mirov di şer de dil dibûn, kesên bi serkewtî ew bi awakî hovîti ji xwe re disaxirandin. Li gora ku lêgendê(destanê) serê esiran çermîdîkin û çermên wan bi awakî berevaji li ser wan vedigerandin û çend rojan ew li ber tava rojê dihiştin. Ji wan kême kes difilitî, belê yê ku xwe li ber êşê digirt û sax dima, hişê xwe berdida û nema xwe nas dikir. Bêhişîyaa Mankurtî ji vê bûyerê hatiye(B. N.)

2- Ev kampên ku faşîstan Cihû û leşkerên esîr di wan de îşkence dikirin û dikuştin.

3- Navê kampên ku di heyamê Stalin de, hebûn.

* Ev nivîs ji Rojname "Nezavîsi-meya Gazete ya heftane (18.04. 1991) ya Rûsî ji aliyê Bavê Nazê hatiye wergerandin.

Stîriyên me

Lawikê Berrivanî

Ronakbîrên analfabet

Di van 5-6 salên dawî de di nav Kurdên Kurdistanê Bakur de kesên ji xwe re dibêjin "ronakbîr" gelek zêde bûne. Nîşana ronakbîriyê -intellektueliyê- îro pirr populêr e, her kes dixwaze wê bi sînga xwe ve ke.

Di rewşek wiha de, ji bo ku meriv şeb û şeker ji hev bigerîne, bivê nevē meriv vê pîrsê ji xwe dike:

-Gelo kî ronakbîr e? Pîvan û wacibên ronakbîriyê çi ne? Gelo her kesê xwenda, xwedî diplome ronakbîr e ya na?

Bersîva pîrsa "kî ronakbîr e" pirr û pirr zehmet e. Çimkî tarîfeke umûmî ya ronakbîriyê tuneye. Lê li gel vê jî, gelek tarîfên ronakbîriyê hatine kirin. Ji wan tarîfan yek, kême zêde dikare wiha be:

-Ew kesê pêşverû, xwenda, bi kultur, zana ku xwe weqfî xizmeta aqil, ilîm, heqî û rastiyê kiriye, ronakbîr e.

Wek xuya ye bi rastî jî ronakbîrî ne sinetekî hêsa ye, ne karê her kesî ye û her kesê xwedî diplome jî ne ronakbîr e. Em dibînin ku ronakbîrî, mesûliyet û fedekariyên pirr mezin dixwaze.

Berî her tiştî, ronakbîrî şiklekî jiyane ye. Guhê kesê ronakbîr baştir dibihîze, çavê wî, heqiyê û neheqiyê, rastiyê û çewtiyê baştir ji hev digerîne. Li gor kesên alel'ade bêtir dizane, bêtir û zûtir îdrak dike.

Ji ber ku hin tiştan dizane û dibîne, ew yek jî mesûliyeta wî ya li hember gelê wî, li hember civata wî û li hember însaniyete zêde dike.

Hîssên însanî û civakî yên wî pirr bi pêş ketine û gelekî hessas in. Lema jî di şertên herî dijwar de berî her kesî li hember neheqiyê, li hember kedxuriyê, li hember zulm û zora sinifî û netewî dengê xwe bilind dike; bi kurtayî li hember bêedaletî û newekheviyên civakî tu caran çavên xwe nagre, guhên xwe kerr nake û serê xwe li hember zulmê û zulmkaran natewîne. Dixwaze bila ev şêla wî, serê wî têxe belayê jî...

Ez dibêjim piştî hewqas gotin û tarîfan êdî em dikarin li ser ronakbîrên Kurd bisekinin û hin xusûsiyet û qarekerên wan ên balkêş ji nêz ve nas bikin.

- Bi baweriya min xusûsiyeta herî balkêş a "ronakbîrên Kurd" analfabetbûna wan e. Yanî ummî ne, bi zimanê diya xwe nikarin bixwînin û binivîsinin -bê guman wek di her tiştî de, di vir de jî hin îstîsna hene-

Xusûsiyeta duduyan, piştî ku mektebê diqedînin, dibin xwedî mal, xwedî îş û kar, dev ji axaftina Kurdî berdidin; Tirkî dibe zimanê diya wan. Îro bi hezaran tixtor, abûqat, mamoste, muhendîs û siyasîyên Kurd hene, ku ji xwe re dibêjin em "ronakbîr" in. Lê li mala xwe bi Kurdî napeyivin û fêr nabin.

Xusûsiyeta wan a sîsiyan, tarîxa xwe nizanin, ji edebiyata xwe bêpar in û xerîbê kultura gelê xwe ne.

Xusûsiyeta wan a çaran, ji vê rewşa xwe ya trajî-komik bê hay in û ji bo guherandina vê rewşê, tu xebat û fedekariyekê nakin.

Xusûsiyeta wan a pêncan, "derd û belayên" dinyayê ji yên gelê wan bêtir wan meşxûl dike.

Wek tê zanîn, ronakbîrên, "dinyayê" tune ne, ronakbîrên miletan hene. Yanî, ronakbîrên Tirk, ronakbîrên Grekî, ronakbîrên Fransîz hene. Û ew, bi zanîna tarîx, edebiyat û zimanê diya xwe, bi hezmkirina kultur û nîrxên xwe yên netewî berî her tiştî ronakbîrên miletên xwe ne. Lê "ronakbîrên" me? Ma ew jî wiha ne gelo?

Axir wiha ne, yan ne wiha ne, ya muhim bi wê "analfabetiya" xwe, xwe ronakbîrên Kurd dihesibînin, ket û mir...

HEVPEYVÎN

Mirazê Uzo Cewherî:

"Tiyatroya Kurdî ji bo min vatiniyeke netewî ye"

Mirazê Uzo Cewherî rejîsorê Tiyatroya Kurdî ya li Tiflîsê ye. Tiyatroya Kurdî 10 saliya xwe temam kir. Bi vê helkeftinê (bi vê munasebetê) endamê redaksiyona me H. Mizgîn li Tiflîsê bi rejîsorê tiyatroyê Mirazê Uzo Cewherî re rûnişt û ji bo xwendevanên Armançê peyivî.



Mirazê Uzo Cewherî

Ez ji alî xebatê ve wek esas xebata xwe ya Tiyatroya Kurdî hesab dikim. Ji ber ku merivê Kurd li ku xebat dike bila bike, eger ji bo miletê xwe xebat neke, xebat pûç e. Bi bîr û bawerîya min ez di rojnama Ermenî de çî bikim jî wê bête jibîrkirin, lêbelê tiştên ku ez ji bo Tiyatroya Kurdî dikim wê bimînin, neyên jibîrkirin. Tiyatroya Kurdî ji bo min vatiniyeke netewî ye û ez vê yekê wek deynê stûyê xwe dibînim.

Ez zewicî me û du zarokên min hene. Qîza min li Unîversîta Tiflîsê di fakolta filolojiya zimanê Rûsî de dixwîne û kurê min jî diçe sinifa 8'an. Xanima min li Unîversîta Tiflîsê beşa zimanê Farisî kuta kiriye. Lê îro xebata wê ya himî xebata Tiyatroya Kurdî ye û artîsta vê tiyatroyê ye.

Armanç: Tiyatroya Kurdî ya li Tiflîsê kengê û çawa dest bi xebata xwe kir û di vê xebata we ya hêja de tengasî û kêmasiyên we çî ne?

M. U. Cewherî: Wek min got; di sala 1974'an de ez hatim Tiflîsê û di vê salê de min niyet kir ku dest bi hazîrkirina Tiyatroya Kurdî bikim. Ev niyet ne tenê ya min bû. Di wê demê de di Komsomola Tiflîsê de Komela Ciwanên Kurda hebû. Ev niyeta xebata tiyatroya Kurdî ya wan bû û bi wan dest pê kiribû. Me xwest pêşî tiyatroya zarokan ava bikin. Lê belê pêk nehat. Tiyatroya me ya îro bi temamî di sala 1979'an de saz bû. Me piyesa pêşîn di Gulana 1980'yî de pêşkêş kir.

Wê demê jî û îro jî problemên me bi hezaran in. Problema herî girîng û

Armanç: Tu ji kerema xwe re di karî bi kurî behsa jiyana xwe bikî.

M. U. Cewherî: Ez di sala 1947'an de li gundê Pampa Kurda hatime dinê. Min li bajarê Tiflîsê bi zimanê Ermenî xwend. Di sala 1967'an de min fakolta filolojiya ziman û edebiyata Ermenî kuta kir.

Min ji sala 1968'an heya 1974'an li beşa tiyatroya Wezareta Çandî (Kulturî) ya Ermenistanê kar kir. Di sala 1974'an de min bar kir û ez hatim Tiflîsê û pêşî li Tiyatroya Ermenî ya li Tiflîsê kar kir, piştê jî ez derbasî Rojnama Gurcîstanê ya bi zimanê Ermenî bûm û niha jî di redaksiyona vê rojnamê de berpirsyarê beşa çandî û medeniyetê me.



Bîstîtek ji piyesa "Sinco Qîza Xwe Dide Mêr"

pêşîn peydakirina artîstan bû. Karê tiyatroyê naşibe karên din. Di karê tiyatroyê de ya herî girîng ew e ku tiyatroya bi xwe divê di ruhiyeta mirov de hebe û mirov divê di vî karî de bîkaribe guhêrbar (fleksîbîl) be.

Sala ku me dest bi xebata xwe kir, kesên ku dixwestin di vî karî de cih bigrin gelek bûn. Salona me têra me nedikir, piçûk bû. Ji bo tiyatroya pêşîn jî me re 13 kes pêwîst bûn, lê çî heyf me nikaribû jî nava 40-50 kesî 13 kes derxistana. Ev yek problemeke pir mezin bû. Cara pêşîn bû û me jî sifirê dest pê dikir.

Problema din a girîng peydakirina artîstên jin bû. Di nav me Kurda de hê jî mîrasên ji dema feodalîzmê, jiyana xwe didomînin. Xelkê me tim digot; "Ma ne şerm e ku jin derkevin sehne?" Ev problema dijwar hê jî heye. Ji ber vê yekê min alîkarî kir ku xanima min jî têkeve nav karê tiyatroyê. Mudirê me jî xanima xwe anî. Ez bi serbîlîndî dikarim bibêjim ku her du xanim jî bûn artîstên gelekî jîr. Me berê xwe dida malbatên Kurda û tîka dikir, hêvî dikir da ku qîzên xwe bişînin Tiyatroya Kurdî. Bi vî awayî me pênc qîzên Kurda kirin artîst.

Bidestxistina piyêsên Kurdî jî problemeke mezin bû. Tunebûn û îro jî tunene. Ew piyêsên Kurdî ku me peydakirine ez wek drama bilind hesab nakim. Lê mecala me hewqas bû, me li gor mecala xwe hin tişt afirandin. Di Kurdî de metelokek heye; "Mirov gavên xwe li gor bera xwe davêje". Îro jî

di destê me de piyêsên Kurdî kêr in an jî tune ne. Rast e, ji bo tiyatroya me hin piyêsên tîn nivîsandin (ji alî nivîskarên li Êrîvanê, Tiflîsê û hwd.), lê pir mixabin gelekî sist û sivik in. Ji ber ku ew di kar û barê xwe de ne profesyonel in, piyêsên Kurdî ku tîn nivîsandin jî ne profesyonel in. Kar û barê me di dereca amatori de dimîne. Eger nivîskarên me yê li derê Sovyetê jî ji me re binivîsandina û bişandina, emê gelek şabûna. Hêviya min jî we, ji Redaksiyona Armançê ew e ku me bidin naskirin daku nivîskarên me ji me re binivîsin.

Problema din ew e ku; di nav 70-80 salên li Sovyetê de me jî urf û adetên xwe gelek tişt wînda kirine. Me ziman jî bîr kiriye. Em îro nizanin bi rastî kincên me yê gelêrî çawan in, di rabûn û rûniştinê de ya orjînal çî ye, çawa ye. Ev yek di xebata me de dijwariyeke mezin peyda dike. 15-20 sal berê di nav me de kal û pîr hebûn û urf û adetên berê koçkirinê dizani-bûn. Wan jî me re qal dikir. Lê îro ew kal û pîr tunene. Pîr caran jî me re tê gotin ku kostûmen em li xwe dikin ne yê orjînal in.

Wekî din jî problemên me gelek hene, lê wek adetê dibêjin; em gelê Kurdî tim û tim xwedî problem in. Lê dibêjin; "Xwedê yek e, dergeh hezar in". Ji wan hezaran helbet wê dergehê jî me re jî vebe. Belkî tiştên ku me jî bîr kirine paşde vegevin, bi dest me bikevin.

Armanç: We heya niha çend piyês pêşkêşkirin û hûn naveroka piyêsan çawa hilbijêrin?

M. U. Cewherî: Di nav van 10 salan de me 15 piyês hazîr kirine. Piyesa pêşîn a Eskerê Boyik "Sinco Qîza Xwe Dide Mêr" e. Wekî din jî piyêsên Kurdî "Xecê û Siyabend", "Zarîna Çiya (Çi-hangir Axa)" ya Ezîzê Gerdenzêrî ne. Piyêsên din ne yê Kurdî ne, me jî zimanên din tercûmeyî Kurdî kirine. Piyêsên ku bi naveroka xwe ve nêzî pîrs û pîrsgirêkên Kurda ne, hatine hilbijartin û tercûmeyî Kurdî bûne. Me ne tenê ziman tercûme kiriye, lê piyês bi her awayî guhertiye Kurdî. Wek ni-

mûne piyesa Şamxalov (Azerî) "Xwe-sû", piyesa Xugayet (ji gelê Os) "Cî-nar", piyesa Papayan (Ermenî) "Zavê ji Welatê Dereke", piyesa Ananyan (Ermenî) "Mala Min Ne Mala Te ye", Piyesa İyoselyannî (Gurcî) "Hele Hêj Erebe Wemegeriyaye" û yê mayîn. Hin piyês jî me wek xwe hilgirtine, tu guhertin tê de nekirine. Wek piyesa Jurî Vîzbor (Rus) "Çiqilê Spîndarê", piyesa Çiyaxayîdzê (Gurcî) "Ji Saet 3 Heta 6'an".

Li vir dixwazim bala xwendevanan bikşînim ser tiştêkî; ew piyêsên ku me wek xwe hiştine û tenê ziman tercûme kirine, ji alî Kurda ve nehatine ecibandin. Me li ser van piyêsan 6-7 mehan xebat dikir û 2-3 caran dileyîst û hew kes dihatin. Ev jî dide xuyakirin ku civata me tiştên nêzî ruhiyeta xwe dixwaze. Min li jor gotibû ku me gelek tişt wînda kirine, lê me ruhiyeta Kurdîtiyê wînda nekiriye û ev yek min şa dike û hêjayî pîrozbahîyê ye.

Me di nav van xebatên 10 salan de tim û tim lêkolîna sedemên koça me ya 75 sal berê dikir û piyesa "Zarîna Çiya" bi armanca dayîna bersivên sedema koça me anî zimên. Wek te jî dît; me di piyêsê de sê pîrsên himî anîne zimên; 1- Me çîma ji welatê xwe koç kir, 2- Wek netewe em kî ne û 3- Li Sovyetê me çî bi dest xist. Bersiv ev in; 1- Me bi koçkirinê şaşîtiya herî mezin kir, 2- Em wek netewe Kurd in (hebandin çî dibe bila bibe, dixwazî misilman, Êzîdî û dixwazî xaçparêz be), 3- Me li Sovyetê tu tişt bi dest nexist, lê gelek tişt wînda kirin. Tiyatroya me wê li ser problemên wiha xebata xwe bidomîne û ji bo me îro ev yek gelek ferz e. Hedefa me geşkirina hebûna Kurd û Kurdîtiyê ye.

Armanç: Bi rastî we karekî pir hêja kiriye. Xebata we hêjayî pîrozbahîyê ye. Gelo daxwaziya we jî me ji Kurdên li Ewropayê çî ne?

M. U. Cewherî: Ev pîrs pîrsek di çî de ye. Niha îro rewş li Sovyetê hatiye guhertin. Ew tîrsa ku berê di nav me de hebû û hevdiîna me bi dizîbû, îro



Bîstîtek ji piyesa Siyabend û Xecê

Personelên Tiyatroya Kurdî li Tiflîsê

Rejîsor û Şef: Mirazê Uzo Cewherî

Senograf: Şamîr Teyrînasyan
 Artîst: Culçera Usîf (xanima M. U. Cewherî), Kulîlka Eso, Besa Mihemed, Almasta Wezîr, Naza Xeto, Şalîkoyê Miraz, Aramê Miraz, Tîtalê Evdo, Şîrîne Emo, Binbaşê Axê, Misûrê Qalîxan, Temûrê Keleş, İsmailê Usîf, Şalîkoyê Sefo

Gerrek li nav şêrebirîndarên warwêran

Bi hêvî û endîşên mezin me gavên xwe avêtin axa rizgarkirî

Di ser serhildan û şikestina gelê Kurd ê Kurdistanê Iraqê re du meh derbas bûne. Tarîxa Kurdistanê di van çend mehên dawiyê de bûye şahida bûyerên wiha mezin û bi lez ku tu caran nedîtîye. Bûyer wek babelîskan li pey hev dizivirin û diçin. Meha Sibate, hîn dewrek ji dewra diktatoriya herî xedar a Saddam bû. Adar bû şahida rabûna miletê ku wek dêwekî rabe ser xwe. Nisanê, du milyon Kurd li welatê wan bi çol û çiyên xistin. Îro hêzên mutefîk hatine Kurdistanê, ji Behdînan leşkerên Iraqî paşde vekîşiyane. Li nivê herêma Soran kontrola pêşmerge heye. Kurdistan hema bêje nivî di destê Iraqîyan de ye, nivî jî di destê pêşmergeyan de ye.

Peymana agirbestê hatiye îmzekirin, şer rawestiyaye, guftûgoyan dest pê kirine. Her roj xeber bela dibin ku ha îro, ha sibe wê peyman a otonomiyê bê îmzekirin.

Di demek wiha de wek her Kurdekî dilsoz û welatperwer gurgurpa dilê me ye, geh hêviyên mezin bi me re çê dibin, geh em dikevin endîşên mezin. A di rewşek wiha de em berê xwe didin Kurdistanê, dixwazin Kurdistanê bi çavên xwe bibînin.

Di 1'ê Tirmehê de em, di kelekela germa nîvro ya havînê de bi kelekê ji çemê Dicle derbas dibin û piyên xwe davêjin ser axa Kurdistanê Iraqê. Li vî alî meqerên pêşmergeyan li ser hidûd, li ber devê çem in. Em hinekî li wir bihna xwe vedidin. Firavîna pêşmergeyan masî ne ku nuh ji çem hatine girtin. Em jî dibin şirîkên firavîna wan.

Ber êvarê gava dinya hinekî hênîk dibe, bi otomobîlê em tîndê Dêrebûnê. Gund di wextê xwe de gundê filehan bûye. Gundekî xweş bûye. Lê îro xirbeyek e. Berî serhildanê bes bingehêki eskerî bûye. Nuha pêşmerge lê dimînin.

Zaxo

Herêma Dihokê di bin kontrola hêzên mutefîk de ye. Ji me re dibêjin ku "noqtên muhîm û riyên ketin û derketina ji bajarên ji alî wan ve tîndê kontrolkirin, li herêma û li bajarên nahêlin kes bi çek bigerin. Bes di rîya Cepha Kurdistanê Iraqê re meriv dikare îcaza çekhilgirtinê werbigre". Em bi çek in û naxwazin çekên xwe bidin girtin. Dibêjin ku "gava meriv diçe noqta kontrolê, eskerên mutefîk dipirsin ka çek bi meriv re heye an na. Gava çek bi meriv re hebe, digrin dermanekî weka sprayê lê direşînin û didin meriv, lê ew çek di cî de bi hev ve dikele û nema bi kar tê".

Pêşiyê em dixwazin çekên

xwe li Dêrebûnê bihêlin, paşê di rîya partiyê re bigihînin xwe, lê pêşmerge dibêjin ku "riyek hinekî dûrtir heye ku meriv pêşiyê diçe ber bi başûr ser rîya Dihokê û di wir re vedigere Zaxoyê, li ser wê riyê kontrol tune, loma hûn tevî çekên xwe di wê riyê re dikarin biçin Zaxoyê". Em dibêjin "baş e, bila hinekî dûr be, lê emê di wir re biçin Zaxoyê".

Em li teksî û pîkapekê siwar dibin û ber bi başûr ve dikevin rê.

Li ser rê em rastî hin gundên nûavakirî tîndê. Şofêr dibêje: "Ev gund ji bo Ereban hatibûn çekirin, piştî ku hukumetê gundiyên Ereban anîbûn vir û ew li vir bi cih kiribûn, erdên Kurdan dabûn wan. Ev 15 sal in Ereban zadên van gundan dixwarin. Lê îsal ku serhildan çêbû, Ereban erdên çandî û gund bi cih hiştin û bazdan çûn. Niha xwediyên van gundan ên eslî ku Kurd in, hatine genim û dexlê îsal ji bo xwe diçin". Yek ji wan gundan jî yê mala hevlekî û yê merivê wan e Gava êvarê li Zaxoyê em dibin mêvanên mala wan, xwarziyên wî û pîsmamên wan ji behsa van gundan dikin ku 15 sal in Ereban dixwin, ew jî li vir li Zaxoyê bêtî ku karibin tiştêki bikin, bi keser temaşê dikin. Nuha hêvî dikin ku şoreş erdê herkesî lê vergerîne û ew jî bi karibin berê îsal ji bo xwe hilînin.

Piştî muxribê ye, tarî ketiye erdê gava em dikevin nav Zaxoyê. Li nav Zaxoyê li ber Qeymeqamiyê panzerêk heye ku du leşkerên mutefîkan tîndê de ne. Ne ew ji kesî tu tiştî dipirsin, ne jî kes bala xwe dide wan. Herkes bi dilrehetî di sîkê de diçe tîndê. Lê xwiya ye ew panzera li wir û ew her du esker ewleyî û dilrehtiyêke mezin li nav sîkê belav dikin.

Zaxo bajarekî (qezayeke) mezin e û 10 km ji hudûdê Tirkîyê dûr e. Di doleke ne ewqas fire de ava bûye ku sê aliyên wê çiya ne, bes rojhilatê wê vekirî ye. Ev dola zirav û dirêj li aliyekî derî li Zaxoyê vedike. Bajarekî paqij tîndê hesêb, lê di destpêka wê meha havînê ya navîn de gelek germ e. Herçî roj çûye ava jî, hewa germek ziwa ji Zaxoyê hildikişê. Tava Tirmehê esmanê li ser bajêr tengijandiyê.

Em li meqerê Cepha Kurdistanê peya dibin. Bînyek resmî ya fireh a yekqatî ye; dora wê bi hewşek fireh û bilind hatiye rapêçandin. Em di deriyê hewşê re dikevin hundur. Bexçekî fireh derdikeve pêşiya me. Riyek ji hewşê dikîşe heta ber deriyê bînyayê. Herdû aliyên wê bi darên çaman hatine girtin. Piştî daran bexçe çîmenkirî ye. Li her du aliyên

pêşmerge; hin rûniştî ne sohbet dikin, hin ji xwe re digerin û hin jî paldayî ne. Xwiya ye piçek deriyekî vekirî ye, kî tîndê diçe tu pîrs jê nayê kirin, ku kî ye, yan bi kû de diçe. Pêşmergeyan ku bi me re hatin, bangî mesûlekî dikin, me teslîmî wî dikin û xatir dixwazin. Mesûl xêrhatin li me dike û me dibe odekê.

Bînyakekê rût e. Ne derî, ne pencere, ne kursî û sandalye, ne jî dolab yan mase tîndê de mane. Şebeka elektrîkê ya kevin hatiye rakirin, bi êretî tîndê dinê girêdane û îdareten elektrîk hîn nuh anîne hin odan. Oda ku em tîndê de ne çend kursî û masek lê heye. Lê pencere û deriyên wê tunene, bi çarşefan derî jê re hatine çekirin. Li ser masê telefonêk sor heye lê qabloya wê qutkirî ye, bi kar nayê.

Ava sar û çayê ji me re tîndê, hal hewalê me dipirsin. Em jî dipirsin ku "ev çî bîna ye". Mesûl dibêje:

"Ev bîna berî serhildanê ya îstixbarata dewletê bû. Gava serhildanê xelkê hucûm kirê çî tîndê hebû talan kirin. Nuha ev bînyayê rût û xirabe maye. Piştî hêzên mutefîk hatin, av û elektrîka bajêr çekirin, lê tiştên din hemû wek xwe mane".

Paşê em dibihîzin û roja din li nav bajêr dibînin ku hemû bînyayên resmî wek wê bînyayê hatine talankirin, heta dibistan û nexweşxane jî. Mal û eşyayên xelkê bi xwe jî hatine dizîn, gava şikestinê wê carê yê mayî malê yê çûyî dizîne, yan jî esker û Ereban sivil hatine mal talan kirin.

Rizgarbûna Zaxoyê

Çiroka serhildan û rizgarkirina Zaxoyê, bi qasî ku ji me re tîndê behskirin çirokek pîr înteressant e û kerekereke şoreşa Kurdistanê Iraqê dide diyarkirin. Dixwazim wê çirokê li vir bi qasî ku ji me re hatiye bahskirin, neqil bikim:

Serhildan, li Kurdistanê Iraqê herî dawîn li Zaxoyê berpa bû. Piştî ku serhildan li Ranyayê, Silêmaniyê û Hewlêrê bi ser ket, radyoyên şoreşa Kurdistanê Iraqê bangî herêmên serhildandayî yê Kurdistanê dikirin ku ew jî serî hildin, bajarên xwe ji destê dijmin rizgarbikin. Li hemû deran çekdarên musteşaran (serokcaş)ên ku xelkê ji wan re caş digotin, bi wê qeweta xwe ya mezin tevî serhildanê bûbûn. Berî serhildanê, hejmara resmî ya caşan 500 hezar bûye. Fîlen 300 hezar bûne. Ciyên ku serhildan lê bi ser ketibû, pêşmerge di nav lehiya çekdarên caşan de wîndê bûbûn. Yekî digot, wexta serhildanê

Murad CIWAN

gava hevdîtinek di navbera Mesûd Barzanî û Musteşarekî de çêbû, li nik Mesûd 100 pêşmerge, li nik musteşar 10 hezar çekdar hebûn. De îca bifikire bê rewş çawa bû. Rola musteşaran û çekdarên caş di destpêka serhildanê de kerekereke pîr girîng stendibû. Cephê efûyek giştî ji bo wan derxist. Serokên cephê her yekê ji alî xwe de name ji serok eşîran, serokên caşan re (musteşaran re) dişandin ku ew jî serî hildin.

Namên wiha ji musteşaran dora Zaxoyê re jî hatibûn şandin. Musteşaran jî ji aliyekî ve peywendiyên xwe bi îstixbarata û ordiya Iraqê û bi zabitan re didomandin, ji aliyekî ve jî di rîya hin kesan re peywendî bi partiyên Kurd re danîbûn.

Dawiya dawî musteşar û zabîten îstixbarata Zaxoyê li hev civiyan ku bi awakî plankirî ew jî serî hildin. Li gor planê, wê yekî ji wan biçûya çend RBG (Arbici) li saraya îstixbaratê dana, zabitan wê xwe teslîm bikirana û wê musteşaran tevî xelkê serî hildana; bînyayên resmî îşgal bikirana. Musteşar û navberçiyên soz dan zabitan ku di dema teslîmbûnê de jiyana wan biparêzin. Rabûn ji bo RBG teqandina pêşî Kurdekî meşhûr ê zabîte îstixbaratê bi navê Usif Nezir hilbijartin. Usif Nezir çû du RBG bera saraya emniyetê da. Bi deng re xelkê jî serî hilda. Musteşaran serî hildan, zabîte û leşker bêtî ku şer bikin teslîm bûn, Ew girtin û bi saxî û selametî şandin welatê wan.

Bes tabûrek li dervayî Zaxoyê li serê çiyê hebû ku, ji wir çend top hatin avêtin nav bajarê Zaxoyê. Pêre pêre pêşmerge bi çiyê ve hilkişiyên, dor li tabûrê girtin, ew jî bê şer teslîm bûn.

Bi vî awayî Usif Nezir di nav xelkê de meşhûr bû ku yê serkêşiya serhildana Zaxoyê kiriye ew e.

Dihat gotin ku Usif Nezir Kurd bû û di îstixbaratê de kar dikir, amir mufreze bû, bê însafekî mezin bû, gelek însanên welatperwer ên bê sîc kuştibûn. Ji aliyekî ve jî tîndê caş dikir. Piştî ku bi vî awayî serkêşiya serhildana Zaxoyê kir, bû şoreşger, gava Celal Talebanî ji Sûriyê hat Zaxoyê, usif Nezir çû nik wî û xwe da efûkirin. Çendekî wek terefdarê Yekîtiyê xuya bû, lê gava nihêrt ku li vî herêmê Yekîtiyê bi qasî PDK'ê ne xurt e, nûha bere bere xwe nêzî partiyê dike.

Gava êvarekê em bi erebê li nav Zaxoyê digeriyan, em di ber koşkekê re derbas bûn ku yek ji mezintirîn koşkên Zaxoyê bû;

koşka Usif Nezir. Dihad gotin ku berî ew bibe zabîte îstixbarata hukumetê gelek feqîr bû. Di dema zabîtiya xwe de serwetek mezin bi dest xist û ew koşk ava kir.

Gava em li Kurdistanê Iraqê digerin, em dibihîzin ku hema hema li her herêmê çirokek wek ya Usif Nezir, li ser serokcaş û serhildana wan a wê dawiyê heye. Piştî şoreşê bûne berpirsiyarên çekdarên xwe, çekdarên wan jî bûne pêşmerge, her yek ketine partiyêke Kurd, di wan de bûne mesûl, heta hukum û îtîbara wan ji ya pêşmergeyan eslî pirtir bûye; pêşmergeyan bi salan li çol û çiya mayî, îro bere bere li paş dimînin, rola wan wîndê dibe. Bê-hêvîtiyê û dilşikestinê di nav pêşmergeyan de ne hindik peyda bûye.

Gava em li Sûlawa li rex Amediyê ne, ez bi pêşmergeyekî re li ser rewşa şoreşê sohbet dikim. Pêşmerge, dîtina xwe ya li ser şoreşê bi peyvên jêrîn eşkere dike:

"Me bi salan li çol û çiyên şer kir, em perîşan û aware bûn, birçî û tî man, hatin kuştin, piştî ewqas sal, îro ku şoreş bi ser ketiye, ez nikarim bi xweşîkî û serbilindî li sîka Amediyê bigerim. Ji bo ku ez bikaribim herim, li qahwexanekê rûnim, çayekê vexwim, divê ez herim milê xwe tîndê milê Baasiyekî kevin, destê xwe li ber wî di hev bidim, da ew çayekê bide min". Wê ne derew be eger bê gotin ku dîtina eslî a her pêşmergeyekî eslî a li ser rewşa Kurdistanê îroyîn ev e. Çi trajedî Ya Rebbî!

* * *


Êvarê, em ji meqerê cephê diçin malekê û li wir dibin mêvan, serê sibê di 2'yê Tirmehê de, em derdikevin sîka Zaxoyê, kincên Kurdî ji bo xwe didin dirûtin, hinekî li sîkê digerin, wê êvarê jî li Zaxoyê dimînin.

Ber bi Amediyê ve

Serê siba 3'yê Tirmehê em ji Zaxoyê ber bi Şeqlawa bi rê dikevin.

Li dervayî Zaxoyê kampên penaberan xwiya dikin, kampên ku bi hezaran çadir tîndê de ne. Hemû li der û dora hev li naverasta destê hatine vegirtin. Di vî germa havînê de, ku di bin banê xaniyan de jî mîjîyê meriv dikele, gelo ew di bin van çadîran de çawa îdare dikin?

Piştî niv saetê em deşta Zaxoyê li pişt xwe dihêlin û dikevin herêma çiyayî ya bakurê Kurdistanê



Pêşmerge, dîtina xwe ya li ser şoreşê bi peyvên jêrîn eşkere kir:
"Me bi salan li çol û çiyân şer kir, em perîşan û aware bûn, birçî û tî man, hatin kuştin, piştî ewqas sal, îro ku şoreş bi ser ketiye ez nikarim bi xweşîkî û serbilindî li sûka Amediyê bigerim. Ji bo ku ez karîbim herim, li qahwexanekê rûnim çayekê vexwim, divê ez herim milê xwe têxim milê Baasiyekî kevin, destê xwe li ber wî dihev bidim da ew çayekê bide min". Wê ne derew be eger bê gotin ku dîtina her pêşmergeyekî eslîn a li ser rewşa Kurdîstana îroyîn ev e. Çi trajedî Ya Rebbî!

na Iraqê ku ji niha pê ve êdî emê rêwiyên çiyayên asê û bilind, newalên kûr û teng bin. Em xwe digihînin Batûfa.

Meqerê PDK-I yê Zaxoyê li vir bi cîh bûye. Bepirsîyarê meqer Mele Remezan e, lê ew ne li wir e, alîkarên wî li wir in. Em daxwaza çûna Şeqlawa ji wan dikin û em didin diyarkirin ku emê biçin meqerê Mekteba Siyasî. Teksiyekê ji me re digrin ku pêşiyê em biçin Amediyê û ji wir biçin Şeqlawa. Em bi rê dikevin di herêma Berwariyan re, di Sersingê re derbas dibin. Balafîrxana Sersingê di bin destê hêzên mutefîk de ye. Lê ji meydanê hinekî wêdetir. Saddam Husên li serê lûtikên çiya çend qesrên mezin çêkirine, ku parastina wan di destê leşkerên Iraqî de ne.

Em piştî demekê tî Sûlavê, şelaleyek e di çiyayê li hemberî Amediyê. Amedî li ser girekî wek qelayeke tabîî hatiye avakirin. Bes aliyekî gir xwe digihîne çiyê ku nuha riya çûn û hatinê di wir re diçe Amediyê. Em naçin nav Amediyê, li Sulavê peya dibin. Li wir Şukrî Nêrweyî dibînin. Dibêje Mesûd Barzanî û Celal Talebanî îro li vir bûn, civîn kirin û niv seet pêşî ku hûn werin ew çûn. Paşê em wê êvarê ji radyoyan jî dibihîzin ku Mesûd Barzanî û Celal Talebanî wê rojê bi Generalê hêzên mutefîk re rûniştine. General soz daye ku mutefîk wê nehêlin Iraq êrişê bine ser Kurdan. "Lê" gotiye "divê hûn jî xwe ji şer dûr xînin".

Em ji Şukrî Nêrweyî re mebesta ziyareta xwe didin diyarkirin û dibêjin ku zûtirîn wext em di-xwazin xwe bighînin meqerê Mekteba Siyasî. Dibêje: "Baş e".

Lê wê şevê me dike mêvanên xwe. Meqerê wan li derveyî Amediyê, di nav bax û bexçeyekî di çiyê de ye. Bexçe bi darên sêv û

hinar û gwîz û meywên din xemiliye. Em li ser rewşa Kurdîstana Iraqê sohbetê dikin. Sibehê zû, em radibin, bi ereba ku (pîkabek wek landrowerekê) ji bo me hatiye amadekirin didin rê.

Herêma Barzan wêrankirî ye

4 Temûz, riya me riya 5-6 seetan e. Şofêr dibêje esas ne dîr e, lê ew mintiqe têrçiya ye û rê ne xweş e. Bi taybetî li mintîqa Barzan rê qet nehatiye çêkirin, loma jî dirêj dikêşe. Em bi çiya û gelî û newalan de dikevin rê, tî mintîqa Barzan. Mintîqek asê ye lê tu gund tê de nemane, hemû hatine hilweşandin. Rê di nav gundê Barzan re derbas dibe. Gund bi temamî hatiye xerakirin, kes tê de nemaye. Bes dar û ber û bexçên gund, ew jî bê xwedî û xwedîkirin li wê derê ne. Gava em diçin, li dor û berê gund dibînin ku ji holê û çadiran meqerên Cemaeta Şêx Mehemed Xalid Barzanî (Biraziyê Mistefa Barzanî, Kurê Şêx Ahmed) hatine danîn. Em radiwestin, rismê kaviîlê gundê Barzan dikêşin. Paşê em bi rê dikevin tî digihîjin çemê Roşîn ku hudûdê Barzaniyan û Zêbariyan e. Li dor û berê rê zevî hatine çandin. Gava em tê re derbas dibin, tî çinîn. Şofêr bahs dike ku:

-Ev zevî yê Barzaniyan in. Ji gava Barzan hat valakirin û pêve ev erd ketibûn destê Zêbariyan. Wan dajot û ji xwe re hiltanîn. Îsal jî wan ajotibû, lê piştî serhildanê Barzanî hatine diçin. Şêx Mehemed Xalit li ser vî kariye. Piştî çend deqîqan em digihîjin ser pîrekê ku li wir çemê Roşîn û yê Rêzan tevî hev dibin. Em di pirê re derbas dibin. Li ser çem dest serçavê xwe dişon û cardin di wê riya xîç a wek şiverêkê

re, hevraz û bi fetlok ber bi serê çiyê ve didin rê. Rojê havînê ya germ e. Eger carna ne meqerên pêşmerge Şêx M. Xalid bin, li dorûberê kes xwiya nakin. Piştî ku em digihîjin serê çiyê, vê carê em bi nişuvî serejêr dibin û dikevin mintîqa Şêrwan. Şofêr dibêje esas Şêrwanî jî li ser Barzaniyan tî hesêb. Gava em dadikevin gelî cada qîrîrî carek din dest pê dike. Li ser rê em tî Mêrgesorê ku berê mala Şêx M. Xalid li wir bûye. Lê hukumetê niha Mêrgesor hemû xera kiriye. Li ser kaniyê em radiwestin, avê vedixwin, dest, serçavê xwe dişon. Hin zarak li wir li ser sindoqên fêkî, cigarên biyanî, cola û şekir-mekir difroşin. Em bi rê dikevin. Xuya ye hêşinayî û ava Şêrwan hinekî ji ya Barzan pirtir e. Piştî re em tî ji Serdawê derbas dibin. Şofêr xaniyekî li ser rê di hundurê hewşek mezin de, di nav hin darên fêkî de nişanî me dike û dibêje, niha ev xanî çiyê mayina Mesûd Barzanî ye. Xanî yekqatî ye û bi rengê qehweyî an morekî tarî hatiye boyaxkirin.

Piştî deh deqîqan di destpêka Geliyê Alî Begê de em digihîjin sêriyanekî. Gelî li ser destê rastê dimîne. Riyek di wir re diçe Şeqlawa, Hewlêr û Silêmaniyê. Riya milê çepê jî ber bi Diyana, Rewanduz, Qaladiza û Hacıumran ve diçe. Helbet ev bajar ne di rêza hev de ne. Riya her yekî piştî demekê bi aliyekî de vediqete. Em berê xwe didin milê çepê, di destek piçûk re piştî çend deqan em digihîjin qeza Sidîq ku bi Diyana ve ye. Ev qeza li gor ku dibêjin nuh hatiye avakirin. Berê Rewanduz qeza bûye. Jê stendine, kirine nahiyê û bi navê Sidîq di rex gundê Diyana de qezayekê nuh ava kirine ku di esasî de bingehê eskerî bûye. Em tî Sidîq meqerê Partiyê, pîrsa Kerfîm Şingarî di-

kin. Dibêjin ne li vir e, ancax êvarî bê. Em daxwaza çûna nik Meqerê Mekteb Siyasî dikin, dibêjin li Rewanduz e. Em nasekinin ber bi Rewanduzê bi rê dikevin.

Rewandiza Paşayê Gewre

Piştî çarîkekê li pala nizarê Çiyayê Kurekê, li bilindaiyekê Rewanduz xwiya dike. Gava şofêr dibêje ev Rewanduz e, wek taseke ava sar bi ser min de bikin. Rewanduz ku min di kitêba de xwendibû; bajarekî dîrokî yê mezin bi kela û burcan, bi qesr û serayan di xeyala min de bi cî bûbû. Lê ev gundekî basît ê piçêkî mezin wek her gundekî Kurdîstanê ye. Aliyekî wê pala xwe daye çiyayê bilind yê ku her du rexên wê bi kendal û newalên gelek kûr û teng hatine birîn, û du çemên biçûk tî li jêra bajêr digihîjin hev û bi vî awayî wek xendekek kûr li dora bajêr hatibe kolandin xwe li dora bajêr radipêçin. Ava newala alî rojhilatî wê, ji ber germa havînê çik bûye, ya din ez ne şaş bim serekaniya xwe ji şelala Bêxal digire û aveka şîn a zelal tê re diherike. Her du newal jî gelek kûr in (40-50 mîtro) zinarinî mezin (yan jî kendalîni kevirîn) şaqûlî dadikevin heta avê. Fireyîya newalan 15-20 mîtro, cîna belkî jî tengtir dixuye. Meriv dibê belkî xendekek e ku li dora kelayekê hatiye kolan. Bi vî awayê xwe, girê mezin ê ku Rewanduz li ser hatiye avakirin wek kelayeke tabîî dixuyê. Li ser çiyê ku newal digihîjin hev, pîrek hesinî hatiye çêkirin.

Cîba me di ser pirê re derbas dibe û fetlok bi fetlok berê xwe dide hevrazê Rewandizê. Cade di nav Rewandizê re jî hevraz û bi fetlok in. Piştî çend malan, li nav bajêr em di meydanake piçûk re derbasdibin ku topa Westa Recep a ku di wexta Mihemed Paşayê Kore (Rewanduzî jê re dibêjin Paşayê Gewre) de hatiye çêkirin xwiya dike. Li wê meydanê li ser dikeke çimento hatiye qayîmkirin û wek topek ji bo teqandinê amade be, berê xwe daye deştê, pala xwe daye çiyê. Li çiyê herî bilind ê nav Rewanduzê otêlek wek qesrekê hatiye avakirin. Em tî, li ber wê otêlê radiwestin. Meqerê Mekteba Siyasî ya partiyê ev e. Em peya dibin, perê şofêr didinê û dikevin hundir.

Li hundir, li salonê du pêşmerge xort hene. Wext li dor saet duduyê nivroyê ye, germek zêde heye. Li aliyekî salonê li ser masekê semawerek gelek mezin hatiye danîn. Dorûberê semawerê tî qedeş in. Li aliyê din ê salonê ku camekankirî ye (milê rastê gava meriv ji derva dikeve hundir) maseyek û yek-du sandalyên spî yê plastîk danîne. Ji xortan yek xuya ye çaycî ye. Em dipirsin ku ka ji bepirsîyaran kî li vir heye. Dibêjin ku Fransuwa Herîrî li jorê ye. Em rûdinin xort diçe gazî Kak Fransuwa dike. Tê bixêrhatekê li me dike, em bi hev re derbasî oda rûniştinê dibin. Di wê germê de du-sê perwanên ku li qatiya dizîvirin, dixwazin hundir hênîk bikin, lê ji germa havînê ya derve, her bayekî ziwa yê germ ji wan bela dibe ku nahêle xwêdan li ser çavê meriv peyda bibe. Misê-

wa laşê meriv ziwa dihêle.

Min cara pêşî di 1988'an de kak Fransuwa li Racan dîtibû. Wê wextê ez û Hemrêş Reşo bi hev re çûbûn Tehranê, Kerecê û ji wir jî Urmiyê û Racanê. Wê wextê meqerê Cepha Kurdîstana Iraqê û yê PDK li Racanê bû.

Çay ji me re tê em vedixwin. Kak Fransuwa pîrs dike ku me firavîn xwariye yan na. Em dibêjin "na". Firavînê tînin ber me. Bîrinc û tîrşîka kundur û firingiyan e. Pîvaz jî li ber heye. Ava sar jî tînin.

Kak Fransuwa dibêje ku Mesûd li Serdawê ye û divê biçê bi tîlsizê xeberê bide wî, lê vengere. Em qederekê li wê salonê dimînin. Piştî mudetekê pêşmergeyekê tê, dibê "bibûrin me cîh ji we re hazir dikir, loma em dereng man. Me du ode ji we re amade kirine, kerem kin herin odên xwe, îstirehet bikin". Odek li jêr û ya din li qatê jorê ye.

"Em dawî li rîştina xwîna xwe binîn jî baş e"

Piştî êvarê pêşmergekî qelebax li der û dora otêlê peyda dibin, diçin û tî. Em fam dikin ku bepirsîyarekî muhîm hatiye meqer. Piştî bîstîkekê pêşmergeyekê tê cem me dibê ku kak Mesûd hatiye dixwaze bixêrhatekê bide we. Em kincên xwe li xwe dikin û derdikevin qatê jor. Li salona jor du mase û çend sandalyên spî yê plastîk hatine hazirkirin. Hîn em baş rûneniştine ku kak Mesûd di derencekan re derdikeve jor, tê bixêrhatekê me dike, em rûdinin. Dibê ku ji Şeqlawa ji civînekê tê, bes ji bo seredana me hatiye û wê dîsa bizivire. Rewşa dervayî welêt ji me dipirse, em dibêjin ku li derva kesî zêde agah ji rewşa Kurdan, ji guftugoyan nîne, agahdariyên deqîq, rast û rojane nagihin Kurdan û raya giştî. Em diyar dikin ku xelk, bi taybetî Kurd, fam dikin ku çima guftugoyan dest pê kirin û gelek ji wan meselê di cîh de dibînin. Lê hema hema temamiya wan, mesela destpêkirina guftugoyan li Bexdayê, maçîkirina Saddam ji alî heyeta pêşin, beyanên mam Celal û yê wî li ser bawerpêanîna bi Saddam û sulûbên guftugoyê şaş dibînin. Ev zera derî didin rewşa Kurdan, piştigiriya ji bo wan zêf dixin, awirên rayagiştî ya li ser Seddam sist dikin.

Ew jî dide xuya kirin ku piştî şikestina serhildanê, rewşa Kurdan gelek xerab û perîşan bûye, bi çolan ketine. Piştigiriyek siyasî ji derve ji bo Kurdan nayê. Ji bilî guftugoyan tu çara Kurdan nîne. Dibêje ku zirarê tê de nîne ku li Bexdayê guftugo tînin kirin. Her wiha dibêje divê mesela maçîkirinê zêde neyê rexnekirin. Li van herêmên rojhilat usûl wiha ne. Mesele ne şexsî ye. Eger şexsî bûya ez nedîçûm Bexdayê. Heta hevalên me yê partiyê nedixwestin ez biçim. Lê hevalên heyetê wiha xwestibûn, me soz dabû. Ji bo mesela miletekî ez çûm Bexdayê. Hin beyan li ser navê me derketin ku bi rastî me ew ne gotibûn. Heta rojnamevanekî Îngilîzî, piştî ez ji Bexdayê vegeyîyam, li Şeqlawa ji min pîrsî ku min beyana bawerpêanîna

bi Seddam daye yan na. Min jê re got ku "Te li Bexdayê ev pirs ji min kiribûya minê bigota na, çimkî min beyanek wiha nedabû. Lê tu li vir, li Şeqlewa ji min dipirsî, ez dibêjim erê".

Kak Mesûd her wiha dide diyarkirin ku, çêtirîn ji bo Kurdistan ew e ku ji Seddam karibin çî bistûnin, bistûnin û peymanekê pê re îmze bikin. "Heta" dibêje "ya herî xerab; bes efûyeke giştî em karibin bistûnin, ev miletê derbeder û perîşan bê li ser cî û warê xwe rûne, nefesekê jî bistûne cardin ji bo me baş e. Eger sibê riyeke li ber me vebe, em dikarin daxwaza hin mafên zêdetir jî bikin". "Lê" dibêje "îro derketiye ku tu kes qebûl nake ku em heqekî ji otonomiyekê zêdetir bistûnin. Me zîntirîn mafê ku em bi dest xî jî wê otonomiyek be, ev otonomî ne hêjayî wê xwînê ye ya ku miletê me bi salan e dirêje. Madem otonomî ne hêjayî wê xwînê ye, em îro karibin dawî li rêtina xwîna miletê xwe binin, ew jî baş e". Tê xwiyakirin ku Kak Mesûd terefdarê wê yekê ye ku zûtirîn wextê divê Kurd tiştêkî bi Seddam re îmze bikin û bîhna xwe vedin. Dibêje: "Ji sedî nodê milet naxwaze şer bike, dibêje bi çî awayî dibe bila bibe, lihevhatinekê çêkin".

Piştî radibe xatir ji me dixwaze û diçe. Êvarê dereng Kerîm Şingarî tê cem me. Em hinekî sohbet dikin, întibayên xwe jê re dibêjin. Ew jî qala hin zehmetî, bê usûlî, bê serûberî û probleman dike û dibêje: Ev e rewşa miletê Kurd, ev e têgihîştin, zanîn û mêjîyê vî miletî. De îca we divê jî ev e û we navê jî ev e.

Kerîm Xanê Biradostî

5 Temûz: Meqerê Merkezî yê PDGK jî li Rewanduzê ye. Em diçin ziyareta wan. Samî Abdurrehman û hin mêvanên din jî li derûdorê, li salonê rûniştine. Bixêrhatinek germ li me dikin. Qahwê tûnin em vedixwin, hinekî jî der û dorê sohbet dikin. Dema firavîne em derbasî odeyek din dibin. Hê firavîne nehatiye, pêşmerge tî jî Kak Samî re dibêjin

ku "mêvanekî te hatiye". Samî derdikeve û piştî bîhnikekê bi hin zilaman re dikeve hundir. Peyayek hinekî girî lihevhatî yê kej bi şal û şapik û du xortên ciwan ê bi kincên sivîl in. Yê hinekî bi umur esmer û yê ciwantir jî kej e. Kak Samî me bi hev dide naskirin. Xwediyê şal û şapik, Kerîm Xanê serokê eşîra Biradostan e, her du yên din kurên wî ne. Piştî em rûdinin, ew kurên xwe bi me û Samî dide nasîn. "Kurê min ê mezin" dibê Kerîm Xan "zabit bû, di Ordîya Heres el Cumhurî de. Piştî van bûyeran min bang kir, got lawo dev jê berde were malê".

Samî li ser vê yekê dibêje: "Welleh Kak Kerîm Xan baş e ku gencên Kurdistan di nav eskeriyê de hebin, lê bê feyde ye ku nahêlin bigihîjin cî û meqamêkî hêja û bilind". Kerîm Xan kurê xwe yê piçûk jî dide nasîn, dibêje:

"Ew jî muhendîsê mîmarî ye. Ev 12 sal in li Îtalyayê ye". Samî li kurik vedigere, dibê:

"Êdî mesela avakirina Kurdistanê dimîne li ser mîmarên zana yên wek we". Kurik jî dide xwiyakirin ku, mesrefa lazîm bê tefsîskirin her tiştêkî hêja dikare bê ava' rin. Piştî bi çend peyvyan behsa îmarîya Ewrûpayê û bi taybetî ya Îtalyayê tê kirin.

Gava ev sohbet tê kirin, firavîne jî hatiye danîn û em firavîne dixwin.

Kerîm Xan ji wan serokeşîran e ku tîkiliyên xwe berî serhildanê bi hukumetê re parastibûn. Eşîra xwe bi çekên hukumetê bi çek kiribû. Eşîr li ser hudûdê Îranê dimîne. Di şerê Îran û Iraqê de li gor Kerîm Xan wan ji hezaran zêdetir pasdarên Îranî kuştibûn. Bi vî awayî Kerîm Xan mintîqa Biradostan ji wêrankirina hukumetê xelas kirîye. Piştî li gor ku hat gotin 40-50 gundên Biradostan li mintîqê hene.

Di serhildanê de Kerîm Xan û eşîra xwe jî serî hildabûn û niha jî li alî şoreşê ne. Yek ji wan serok eşîran e ku bi hev re çûbûn generalê Amerîkî dîtibûn, daxwaz kiribûn ku zû bi zû esker ji Kurdistanê venekîşin, heta peyman otonomiyê tê îmzekirin, li Kurdistanê bimînin.

Loma, piştî bixêrhatin û hal pirsînê, Samî bi henekî peyvekê

jî di ber Kerîm Xan re davêje:

"Kak Kerîm Xan, hûn serokeşîr ji me siyasiyan jêhatîtir in. Em siyasî çûn li Bexdayê bi yekî piçûk re rûniştin, hûn serokeşîr çûn bi yên herî mezin re rûniştin". Kerîm Xan jî bi çend peyvên girover wiha nîşan dide ku siyasî serokê milet in ew jî di riya wan de ne û alîkarê wan in.

Kerîm Xan, li gor ku tê gotin bi YNK re di tîkiliyê de ye. Heta hinek dibêjin; Mam Celal gotiye, endamê Komîta Merkezî ya me ye. Lê xwiya ye yê ev yek digotin henek dikirin.

Qasî ku ji peyva wî tê famkirin, Kerîm Xan (ihtîmalek ne biçûk jî li ser daxwaza Mam Celal) hatiye ji Samî re bide xwiyakirin ku divê heyet zû bi zû û bi şertên giran otonomiyê qebûl neke, îsrar bike hin mafên zêde bistûne. Hasilî ew ne terefdarê lihevhatinekê bi lez û bez e.

Xwiya ye ji PDK û ji Mesûd Barzanî ne ewqas xweş e. Dibêje: Mesûd nameyek ji min re şandiye ku ez herim civînê, lê ez neçûme".

Piştî ez dipirsim, dibêjim "ji berê de navbeyna Biradostan û Barzaniyan ne ewqas xweş e. Erê ne dijminê hev in lê ne ewqas germ in jî bi hev re". Kerîm Xan venaşere ku îro tîkiliyên wî bi hukumeta Îranê re hene. "Heta" dibêje "di wextê şer de, me ji hezarî zêdetir pasdar kuştin, di wan erdan de veşartin. Îro me tîkiliyê bi wan re danîne, ji me xwestin ku em hestiyên miriyên wan teslîmî wan bikin, me ev yek bi cîh anî. Wan ji me re gotin, hûn ji me çî dixwazin. Me got hûn rê li me vekin û wesîqan bidin merivên me ku em karibin, xwarin û erzaq ji wî aliyî jî bo xwe binin baş e. Gotin "bila".

Kerîm Xan piştî behsa zozanên Biradostan dike ku di vê germa havîne de çiqas hênîk û xweş in û dibêje "niha bi şevan divê meriv bi palto û cilkên qalind bigere". Ew Samî dawetî zozanan dike. Samî jî jê re dibê "eger mesela destpêkirina guftûgoyan dereng bikeve, soz ezê van biraderan jî (qesta wî em in) bigrim û emê werin mêvaniya te". Kerîm Xan jî dibê "ser çavan". Piştî xatir dixwaze û radibe diçe.

Piştî firavîne, odakê ji me re amade dikin ku em razin, îstireheta nava rojê bikin. Samî jî ji bo îstirehetê diçe oda xwe.

Piştî êvarê bi qasî niv seetekê em bi Samî re rûdinin û li ser guftûgoyan diaxivin. Ew agadariyan li ser guftûgoyên bûyî dide. Em jî dîtînen xwe li ser guftûgo û uslûbên guftûgoyan, întibayên xwe yên li ser rewşa bê rîk û pêkiya Kurdistanê Iraqê dibêjin. Piştî re gava em bi Mesûd Barzanî, Celal Talabânî, Dr. Mahmûd Osman, Aziz Muhamed û Qadir Ezîzî re jî rûdinin, em her van dîtînen xwe ji wan re jî dibêjin. Noqtên dîtînen me ev in.

-Guftûgo zarûrî bûn, baş bû ku guftûgoyan dest pê kirin, lê;

-Çêbûna guftûgoyan li Bexdayê,

-Maçîkirina Mam Celal û yên din û beyanên wî û Mesud Barzanî li ser bawerpeanîna Sadam û rejîma wî, beyanên li ser rewşa guftûgoyan ku dihat gotin gelek tişt hatine helkirin, di nêzik de wê peyman bê îmzekirin, şaş bûn. Ev çeka herî mezin a destê Kurd (raya giştî û piştîgiriya cîhanî) jê distîne.

-Cephe û partiyên Kurdistan, roj bi roj bi înfomasyonên rastîn miletê Kurd û raya giştî ya cîhanî agahdar nakin, ajansê Kurdî nîne, agahdarî zêdetir di riya ajansên Iraqî re digihin dinyayê,

-Heyetek guftûgoyan heye ku bi Iraqê re rûdinê. Lê li alî din tu dibêjî qey her Kurdek jî di vê heyetê de ye, kes karekî din nake. Hemûyan berê xwe dane guftûgoyan.

-Guftûgo tî kirin. Erê quweta Sadam şikîyaye. Lê Kurd jî bê quwet in, hêzek çekdar a profesyonel ku bikaribe erdê rizgarkirî biparêze tune, ji bo parastina erd û bajarên rizgarkirî tedbirên esasî nayên wergirtin, her Kurdekî rakiyê çek û bê ser û ber digere. Çekdar xelkê tehdîd dikin, dikujin, dizî û talan zêde bûye. Ewleyî û îstikrarî nîne, anarşî heye. Gava Sadam vê dibîne dizane ku Kurd jî nikarin tu tiştî bikin, loma di guftûgoyan de tawîzan nade û guftûgoyan dirêj dike. Çimkî Sadam dizane ku peyman îmzekirin an neîmzekirina bi Kurdistan re, li ber

çavê mutefikan wê tesîrek li ser mayîn û nemana Sadam neke. Loma jî di mesela Kurdistan de û ya guftûgoyan de ecêla Sadam tune.

-Kurd her roj beyan didin ku êdî şer çênabe. Eger hûn dixwazin şer çênebe, wêf di guftûgoyan de xurttir bibin û Sadam mecbûr be ku mafên miletê Kurd qebûl bike û peymanek maqûl îmze bike, divê bi wergirtina tedbirên li jor û rakirina anarşî û talanê bidin îspatkirin ku bi her awayî hûn amade ne welatê xwe biparêzin û îdare bikin.

-Baş bû ku Kurdistan bi serê xwe guftûgo kirin. Çimkî ji bin barê giran ê muxalefeta Iraqê û yê hin hêzên din derketin, bi biser-xweyîya xwe barê doza xwe hilgirtin. Vê yekê kêfa Kurdistan û ya dostê wan anî. Lê îro xeterek peyda bûye ku Kurd vî carê têkevin bin barê Sadam ku ji yên berê garantî e û hemû jî dozêk qirêj, bêdalet zulmkar e ku Kurd bixwe ev sîh sal in e qurbana vî dozê ne. Ger wiha be Kurd nikarin vî barî rakin, wê di binî de yekcar bipelixin. Loma jî divê Kurd ji mesela beşdarbûna di hukumetê de zêdetir, li ser wergirtina otonomiyê û bicîkirina rejîmeke demokratîk bisekinin. Mesele ne hukumet lê rejîm be.

Saet li dor pêncê êvarê sohbeta me xelas dibe. Saet di şevan de, li Xelîfan merasîma vekirina meqerê serkirdayetiya siyasî ya Cepha Kurdistanê heye. Samî Abdurrehman tekliîfî me dike ku em jî biçin merasîmê. Dibêje "serokên partiyên siyasî hemû wê werin merasîmê. Hûnê bikaribin wan li wê derê bibînin". Lê wextê me ji bo çûyina wir tuneye. Em spasî wî dikin û xatir ji hev dixwazin. Bi Land Cruiserekê hildikişin nik otêla xwe, ew jî ber bi Xelîfan bi rê dikeve

Hejmara Bê:

Civîna Hewlêrê û Guftûgoyên Otonomiyê

Rojnama Kurdistan

Destpêk r. 12

sen'eta. Mirovên musulman divê xwenda bin, divê bi'elimin dîne xwe. Gelî 'ulemaya, win çîre camî'an behsa xirabîya cahiliyê, qencîya 'ulmê nakin?

Xudê te'ala û Pêxember ('eley-hîsselam) behsa 'ilm û cahiliyê çî emir kirine win dizanin, vana hemîya ji Kurda re we'z bikin. El-hemdu'llahîte'ala, ev e ya dikeve para min ez dikim, êdî ji 'ulemayên Kurda hîvî dikim vî cerîdeya min ji mîr û axa û Kurmanca re bixwînin. Derheqa 'elimandîna 'ulmê de Xudê te'ala û Hezretî Pêxember ('eley-hîsselam) çî emir kirîye ewî bikin eqlê wan de. Ji mîr û axayên Kurda jî hêvî dikim zaroyên xwe heta bîn(bûn) dehdozde salî, gund û bajêrên xwe de bidin xwendinê, bi'eliminîna Mishefa Şerîf û xwendina cerîdeya, ju paşê bikin mekteb û medreseyan Îstembolê, Şamê, Bexdayê. Da Xudê ji hemîya razî be, da win ji

şerê duşmînen xwe emin (?) bin, Xudê qencîyê bide milleta Îslamê.

Niha Sûdan û Misir şerî dikin. Mêrikê Sûdaniya jî berê de mêrên Misirîya ve ne(?) dîsa 'eskerê Misirî dikare Sûdaniya. Em herroj cerîdeya de dixwînin, deh ji Misirîya tînin kuştin, pêncî ji Sûdaniya tînin kuştin. Sebaba vî; xelkê Sûdanê ne xwende ne, xid'e û hileyên şerên vî zemanî nizanin, top û tîngên vî zemanî nînin, hebin jî nizanin bi'emîlînin. Cerîdeya paşî vî, ezê şerê Sûdan û Misirê qenc binivîsim.

Par dewleta me û Yûnanîya şer kirin. Şukur ji Xudê re dewleta me karî Yûnanîya, heyvekê de eskerê Îslamê şaş bajêrên mezin ji seda bêtir gundên Yûnanîya girtin. Ju paşê Musqof ket nêva halî de nehişt em zêdetir biçin, me sulh kir. Şera'îtên sulhê yek jî Yûnan wê çar milyon zêra bide dewleta me. Çiku hê ev pere ne-

dane. 'Eskerê dewletê hê nêv bajêr û gundên wan de ne. Yûnan wê van pera ji dewletên mezinê dinê bike (bigre?) û bide dewleta me. Berî vî şerî dewletên filla gotin qey dewleta me ji bêperetî nikare tu kesî re şer bike. Şukur ji Xudê re dewletê çiqas vî (çiqas xwest) 'esker derêxist û karî dişimînê xwe.

Yûnan dewleteke kiçik e. Xudê neke heke dewletê nekarîbiya Yûnanê, fille wê bi vîna yekcar dewleta musulmanîyê ji dinyayê helînin. Lê wekî heyvekê de me hewqas bajêr û gundên Yûnan girtin. Hemî dewlet man 'ecêbmayî ku hinde zû zû me karî wan.

Çiqas misilman ser dinyayê hebin hemî arîkarîya jin û zaroyên 'eskerên vî şerî de hatin şehîdîyînin dikin. Gelî Kurdîno ez we binînim, qasî destê we hat pera bigihînin hev, bidin mutesserrif û walîyên xwe dirêkin Îstembolê. Ji hemî dera rêdîkin Îstembolê, Îstembolê navê şehîda hemîya nivîsîne

rêdîkin jin û zaroyên wan re.

Ser dinyayê da tu qewm nemane nav û behsa Girîdê nebîhîstin. Ji mîj ve Girîd dest misilmana de ye. Xelkên Girîdê sê bara (para) yek jê misilman in, du bar (par) jê fille ne. Tu cara fille û misilmanên wê derê bê şer nasekinin. Berî salekê dîsa dest şerî kirin. Vê carê şer gelek mezin bî, gelek gund û bajêr xera bîn, şewitîn, çiftlik neman yekcar xera bîn. Gelek jin û zaroyên misilmana ketin destê filla de. Gelek ji wan kiça bîn jinên filla. Gelek zaroyên misilmanê sê-çar salî, debabê wan hatin kuştin, ew xwe ketin destên papazên filla de kirin mektebên xwe de.

Ev zar ê hemî bi'elimin filletîyê. Ew filletîyên ha ji cînsa Yûnanîya ne. Heyfa min têt gelek jin û zar û mîr hatin kuştin, bîn fille. Min çavê xwe rîsmê zarûkek misilman dît, reben çar salî bî, filla sê ciha birîndar kiribîn. Heta niha jî Girîdê şer ne kêm e. Çiqas misilman hebin gelek jê revîn welatên misilmana, hin jê hê mane Girîdê, lê kes newêre biçê gundê xwe, hemîya xwe

dane hev, bajêra de rûtinin(rûdinin), filla gund û zevîyên wan ji xwe re birine. Niha çiqas misilman hebin civiyê dikin, ar(ard) û cil û pera rêdîkin ji misilmanên Girîdê re. Rebena hemî tazî û birçî mane.

Ez ji mîr û axayên Kurda hêvî dikim derheqê qencîya Kurda de çî bêt bîra kê bila ji min re binivîsin, ezê vî cerîdeyê de binivîsim. We jora vî cerîdeyê min nivîsî, divê kaxezê rêkin ji min re Misirê.

[Li Misirê, Metbe'a el-Hîlal de tebî'îye]

(1) Derheqê hemû hejmarên rojnama Kurdistan de ji bo zêdetir agahdarî, binêre: Berhem, no:9/1990 û Kurdistan Press, no:16,17/1987

(*) an jî: "de ku we rê da, eve êdî ezê dest meqsedê bikim".

Li Hambûrgê hefteya a Kurdistanê

Di navbera 12 û 20'ê Çiriya Pêşîn de li Hambûrgê hefteya Kurdistanê çêdibe. Hefta ji aliyê Komîta Piştgi-riya Kurdistan li Hambûrgê tê organîzekirin. Di vê hefteyê de wê li ser di-roka Kurdistanê, edebiyat, ziman, rojnamegeriya bê rawestandî, rewşa Kurdistanê ya nuha, pêwendiyên wê yên navnetewî, rewşa Kurdên li derveyê welat, pîrsa netewî ya Kurdistan, mafên mirovî li Kurdistanê, tevgera jinên Kurd ji di rojê ve hefeteyê de ye. Di vê hefteyê de aktivîteyên kulturî wek film, dîa, muzîk, wêne, raxistî û xwarinên Kurdî jî wê cîyê xwe bigrin.

Di programa hefteya Kurdistanê de ev xal here

12.10.91

Dîroka Kurdistanê; Dr. Golmorad

Moradî (Unîversîta Haydelberg, Almanya)

Yekşem 13.10.91

-Kurd li derveyê welat; Omer Şêxmûs (Unîversîta Stockholm, Swêd), Aso Agace (Hînbûn, Zanîna Kurda li Berlînê, Almanya), Vildan Tanrikulu (Serokê Federasyoan Komelên Kurdistan li Swêdê), Alî Tuku (Yekîtiya Macira ya Civaka Ewropa, Almanya)

Duşem 14.10.91

Ziman, edebiyat û rojnamegeriya Kurdî; Mehmed Uzun, Reşo Zilan (Zimannas, Swêd), Malmîsanîj (Nivîskarê Kurd, Swêd)

Sêşem 15.10.91

Pîrsa Netewî ya Kurdistanê; Hatîce Yaşar (Rojnamevan, Fransa)

Çarşem 16.10.91

Tevgera jinên Kurd; Yayla Monch-Bucak (Unîversîta Oldenbur-

gê, Almanya), Zubeyde (Seroka Kom-jin), Hatîce Yaşar, Gule İletmiş (Siyasetvan-Bremen)

Pêncşem 17.10.91

Mafên Mirovan li Kurdistanê; Mustafa Ozer (Avukat, ji Diyarbekir), Sertac Bucak (Însiyatîfa Mafên Mirovî li Kurdistanê; Bremen), Bayram Ayaz (Mamoste, Almanya)

În 18.10.91

Rewşa aktuel li Kurdistanê û pêwendiyên navnetewî; Hemreş Reşo (Nivîskar, Almanya), Ercumend Sidiq (Nûnerê Cepha Kurdistanî-Iraq)

Yekşem 20.10.91

Şahiya xelasiyê; Şano, Ciwan Haco, Nûrê û koma wê (Koma folklorê ya jina), Dimoqrar - Koma Dîlan (Muzîka Kurdî ya Gelêrî)

MEKTUBÊ DIYARBEKIR

bekir ra zaf nizdî ya.

Îno lej (pêrodayîş) di zaf mêrdimî mirenî. Hewt kişteyê ki şar jînî şinaseno 'eşkara yenî zanayîş labrê çî kes weş nêzano kiştey heme çind tenî yî. Birîndarî hîna zaf î. Tanî vanî 200 ten birîndar o. Birîndaran miyan di mîlletvekîliyê Mêrdinî 'Ednan Ekmen û Ehmed Türk, mîlletvekîliyê Meletya İbrahim Aksoy, serekê HEP Fehmî Işklar, cenîya Mehdi Zana'y Leyla Zana, avukato Sêwrekîj Serhat Bucak û sewbî avukatî estî. Birîndarî Xestexaney Numûnî, Xestexaney Sigorta û Fakulta Tibbî di tedawî benî. Polisan şiyayîş û hameyîşê xestexanan milleti rî yasax kerdo. Kamo ki semedê persayîşî zî şiyoy weyra, tebîştê berdo. Vanî polisan tanî nêweşî xestexane ra girotî berdî îşkencexane. Lej ra pey zaf mêrdimî zî vinî bîy.

Înê zulmê dewleti ra pey, qorrî mêrdimî vanî "Vera terorê ina dewleti, çeki reydi xwi mudafe'akerdişî ra vişer çî ma dest di nêmendî. Xwi rî keyfê kamî ki waşt wa şewî bêro ma cili ra werizno û bero bikişo". Qorrî zî vanî "Madem ki dewleti ma muhazeze nêkena, wa herkes xwi rî yew çeki bigiro xwi bi xwi muhazeze biko". Vanî wextê lejî di gerîllay milleti mîyan di bî, tanîni ti ra vato "Qey şima çekan reydi milleti muhazeze nêkenî?", yînî zî vato "Eke ma çeki biteqni şar zaf kişiyêno, cûka ma çeki nê-teqnenî".

Cinaza Wedatî ra pey yew hewte di Diyarbekir

11 û 12'ê aşma Temmûzi di Diyarbekir di gazetey mi dest nê-kewtî, ez şîya ki bierîna va "qediya".

Înî di rojan miyan di her kes yew xebere vano. Çew (kes) nêzano ti ra kami raşt a, kami zur a. Tanî vanî "Se ten kişiyawo, hezar tenî zafê zî birîndar esto". Raşt a zî zaf birîndarî estî ki tersa polîsan ver nêsonî xestexanan. Televizyona Tirkiye vana "Hîrê tenî kişiyayî". Kiştey û birîndarî hîna zaf şarê teberdê Diyarbekir ra yî ki hameybî cinaza Wedatî.

Îno hing di Diyarbekir di 500 kes vinîbiyaye wo, nêaseno.

12'ê Temmûzi di, teştare ra pey tanî dikandarî derebanê dikananê xwi ancenî war, dikananê xwi padanî. Vanî "Semtê Balık-

çılar di polisan û çend mîltanan dawo pêro" û vanî "Berê Koy di kam ki raştê polisan yeno, yînî tebîşenî benî". Îno çend rojî yo Diyarbekir biya heway Beyrûfî.

Gazetey Cumhuriyetî 13'ê Temmûza 1991 di qalê pancas kiştî (Diyarbekir di) keno. Nuştexan ra Ali Sirmen nuseno vano: "Qey hetanî eyro ta'rîfkerdişê cenîya Vedat Aydınî gore rismê robotê qatilanê yê niviraziyawo?"

13'ê Temmûzi di Diyarbekir di ca'dey û kuçey veng î. Eyro vanî yew kişte Fabrika Çeltûgî (Çeltik Fabrikası), yew kişte zî Kooperatîfa Batikentî di diyo. Vanî roj bi roj Bexçanê Ewselî di, pey Bedenî di û sewbîna cayan di cesedê kiştayan vejîyênî.

14'ê Temmûzi di ez Baxleran ra hetanî Ofîs rayîr a şîya. Mi waşt gazete bierîna, Cumhuriyet nêmendî, mi çend gazeteyê bînî erînay. Kuçey veng î. Cayanê muhîman di polîsî û tîmî vinderte yî.

Ma xebere gênî ki Pîran di yew roj û nêmdî dikandaran dikanê xwi paday. 14'ê Temmûzi di gazete nusenê ki Hêni (Hani), Pasur (Kulp), Pîran (Dicle), Licê (Lice), Farqîn (Silvan), Hezro (Hazro), Cizîri (Cizre), Misêbîn (Nusaybîn) û Tilerman (Kızıltepe) di dikanê nêabî.

Eyro gazetey Yeni Ülke di listeya birîndaran û mêrdimanê vinî-biyayan vejîyay.

Diyarbekir di bêvengey dewam kena, kuçan di hîna zaf esker û polîsî hasenî. Seki sixiyoneti-mo îlannêkerde bibo.

Vanî rojnamevana (gazeteciya)

Diyarbekir, 25. 7. 1991

Ferhengê Kelîmanê Dêrsimî

xo meqefelne: xwi mebetilni, xo me'ezicni

qirvan: qirban, qurban

qurvetiye: xurbetey

rakerdene: akertiş

keno ra: akeno, keno a

ramerediya: rakewtiş, rakotiş, xwi derg kerdiş

ti merediya ra: ti rakewtî, ti koti ra, to xwi derg kerdo

reyna: rayna, hewna, gilana, fina

roste: roşn, roşna

roz: roj, roc

sar: şar

seveknayene: pawitiş, hemet kerdiş, muhazeze kerdiş

sipe: sipî

sit: şit

sileceni: xurbetey

tale: bext, talih, si'ud

tenê: tikê, biney

tawa: teba, çî

ve: be, bi, ebi, eve

venga ... dayiş: veynda ... dayiş,

waxt: dem, deme, wext, zeman

welê: weli

xax: xag

xayînenî: xayîney

xiravin: xirab, xirabin

yene: [rojo] êne

yê: ay, ey

zonayîne: zanayîş

zovî: zewbî, sewbî, sowbî, sobî

Hindik-Rindik

BERSÎVA GUNDIYEKÎ

Mufrezeyeke eskerên Tirk li hêla Hekariyê digrin ser gundekî. Piştî ku mala yek bi yek saxî dikin, êvarî diherin mala muxtar. Piştî şivê, yuzbaşî dixwaze here daşirê -tuwaletê- Muxtar, gundiyeke pê re dişîne der. Gundî dide ber yuzbaşî diherin, diherin, ji nav gund derdikevin, diçin nav erdeke beyar û gundî ji yuzbaşî re dibêje:

-Kerem ke, li vira bike!

Yuzbaşî dibêje:

-Ev çî hal e, ma daşira we tune ye?

-Na tune ye. Em tên destava xwe li vir dikin.

-Hûn jî pîr reben mane malava!

Li ser vê, gundî dibêje:

-Rast e, ji xwe heger em reben nemana nuha meyê destava xwe di erdê we de bikira.

MEREQA BÛKÊ

Bûka bajarî cara pêşî bû diçû gund mala xezûrê xwe. Bala xwe dayê keriyek qaz li ber mala xezûrê wê ye. Ji mereqa xwe ranegirt, ji xwesiya xwe re got:

-Ma hûn çawa dikarin di nav hewqas qaz de dik û mirişkan ji hev bigerin?

Xwesiyê got:

-Keça min! Ne hewcî me ye, ew xwe jî hev digerin.

ZIMANÊ CENNET Û CEHENNEMÊ

Kalekî Kurd ji Amûdê bi otobosê diçû Şamê. Bi rê ve ji çentê xwe kitêbek Kurdî derxist û dest bi xwendinê kir. Yê li kêleka wî Baasiyekî temam bû. Di bin çavan re li kitêba di destê Kalo de nerî. Gava ku dît ku kitêb wa ye ne bi Erebi ye, ji Kalo pirsî:

-Apo! Ma ev kitêba tu dixwinî bi çî zimanî ye?

Kalo got, "bi Kurdî ye"

Yê Baasî:

-Apo! Dewlet tune ye, ma tuyê xwendina Kurdî çer bikî?

-Ez bi dorê! Ku li vê dinyê ji min re lazim nebû wê li wê dinyayê ji min re lazim bibe. Çimki li Cînetê her kes ifada xwe bi zimanê diya xwe dide.

Lê ku tu çuyî cehennemê?

Ê li wir jî bi Erebi tê peyivandin û bi Erebi jî ez berê dizanim.

Amadekar: Zinarê Xamo

ŞOTINÊN NAVDARAN

Amadekar: Firat Cewerî

Ji ber ku siyasetvanek bi xwe baweriyê bi tiştên ku ew dibêje nayne, ew ecêbmayî dimîne gava ku yên din baweriyê xwe pê tinin.

Charles de Gaulle

Siyasetvanek li hilbijartina dahatû, peyayekî dewletê jî li nivîşê dahatû difikire.

James F. Clarke

Siyaset karekî zehmet e, yê ku bi dilê xwe ketibê, divê gazinan neke.

G. Grass

Yên siyasetê û exlaq jî hev vediqetînin, tê wê manê ku ew jî herdiwan jî fêhm nakin.

John Morley

Li welatên koran, yê bi çavekî dibe qiral.

Erasmûs

Hukumeta herî baş, ya ku mirovên wê yên bêker herî hindik in.

Voltaire

Qedera hukümetê hertim di destên çekhilgirên wê de ye.

Aristoteles

Hukumeta herî baş ew e, ku bikaribe bextiyariyê bide gelê xwe.

Macaulay

Her kes bi riya xwe diçe buhuştê

Fredrikê Mezin

MEKTUBÊ DİYARBEKİRÎ

Hesenî GİRAN



Birîndaranê Diyarbekir ra yew birîndarî benî keye

(Foto: Novîn)

Vanî qeleminî nişna heme çî ifade biko. Kişiyayîşê Wedatê Bismilîjî (Vedat Aydın) ra pey mi fahm kerd ki ina qali raşt a. Xebera kişiyayîşê wedatî kîrr (kilm) a: "Wedat bi destê gonîweran kişiya!" Key inî çend kelîmey şîni (eşkenê) na mesela ifade bikî?

Ma şonî Ma'den

Ma 10'ê Temmûza 1991 di, se'et 8.10 di Diyarbekir ra, bînaya Partîya Keda Şarî (HEP) ver ra hereket kerd. Ma şonî ki Ma'den ra cinaza Wedatê Bismilîjî biyarî.

Rayiran û ca'deyan di kamî ki ma dîni, destê xwi berz kerdîni, nişanê serkewtişî (zaferî) kerdîni. Ma ki Erqenî (Ergani) resay, şarê Erqenî bi heyecan wîrdî (her di) kiştanê rayirî di vindertbi, silam daynî ma.

Ez rayir ra fahm kena, se (heze) ki ganî û bêganî Wedatî rî biduşmîşî, kişiyayîşê yê ver bikwî. Koyan û kerran, teyrân, vilan, dar û berî veynda yewbînan dawo, qalê Wedatî kenî. Qal qala Wedatî ya. Awa çemê Ma'denî Dîjle hêdî û bêveng herrikiyêna şona. A zî kiştanê Wedatî rî la'net varne-na.

Ma ki ver bi Ma'den şîni, rayir a cayê Mehdi Zana û Yılmaz Odabaşî mi çîman ver ra kewtî. Serekê HEP Fehmî Işıklar û çend milletwekîliyê bîni yîni hetî bî. Personelê Beledîya Diyarbekir zî seferber biyo, ma reydi hamewo. Mi rî qen'et bestêno ki Diyarbekir, Erqenî, Ma'den û şarîstanê bîni yê Kurdistanî heme Wedatî rî 'etiriyênî, yê ver kwenî. Şarî miyan di naşt-daşt a vajiyêna, vanî "Pîlê (gîrdê) Kurdan kişiyawo".

NOT:

1) Riperê desinê hûmara 118-119. a Armanç di, him fotografê Madalya Kurdîstanî seracêr vejîyaybi him zî binê nê fotografan di, qalîney û herayey (çapa) na madalya şaş nusiyaybi (gani qalîney: 1, 5 milîmetre, herayey: 2, 7 santîmetre binusiyaynî).

Ma ageyrenî

Vanî maya Wedatî û cenîya yê çatmey sereyê xwi pey temzîyanê hewzan (keskan), suran û zerdan bestbi.

Cinaza Wedatî, se'et 10.30 di Ma'den ra gîriyay. Ma ki Ma'den ra ageyraynî, hil û gam trafik padîya. Ma hêdî hêdî hamey, ay samed ra zî ma erey kewtî. Rayir ra, ma ki yew ray (gilangi) vindertî, va "Wedatî alaya (bayraxa) Kurdan ro pêşenî".

Gama ki ma Erqenî resay, gedey Erqenî sloganan reydi hamey ma ver a. Ma mat mendî. Xortan û keynekanê Erqenîyîjan sloganî eştîni, nişanê zaferî kerdîni. Keynekan aw daynî milleti. Di-kandaranê Erqenî yê ki rayirê ma ser o bî, dikanê xwi padaybî, derebey yîni antbî war.

'Erebeyê ki ma ver a bî, korma (qoma) cenaynî; rayanê (raywanê) ki ma ver a bî, gîştê xwi berz kerdîni, yîni zî nişanê serkewtişî kerdîni. Elhasil hewt ra hetanî hewtay, Kurdan eyro (ewro) cirênay.

Milleti sloganî eştîni. Tanîni vatîni "Bijî Kurdistan!", tanîni zî vatîni "Bijî serok Apo!"

Erqenî ra pey ma hina asan hamey.

Konwoya 'erebeyan zaf zaf derg bî. Qorrî vanî 5000, qorrî vanî 10 000, qorrî zî vanî 30 000 'ereba konvoy di bî.

Diyarbekir di

Ma ki hamey nizdî Diyarbekir, qorrî gedey kiştî ca'dî di vinderte bî, alaya Kurdan yîni dest di bî, tê şanaynî û silam daynî ma.

Diyarbekir di şar Meydanê Îstasyonî di pê ser bi. Çendi vajî indi (çendi) qelebalix bi. Meydanê Îstesunî di serekê HEP Fehmî Işıklarî qalî kerd. Yê ra pey yew şî mikrofonî ver, va:

-12 Temmuza 1991, se'et 13.00 ra pey hîrê rojî 'eza' (yas) milleta ma ya.

Dim a şarî bi Kurmancî û Tirkî inî sloganî vistî:

- Wedat namire!
- Milletê Kurd namire!
- Şehîden me namirin!
- Bijî Yekîti!

-Kahrolsun kontrgerilla!
-Katiller bulunsun, hesap sorulsun!
Yewna grûbi veyn da, va: - Bijî PKK!

Camîyê Îstasyonî di şarî ni-majê cinaza kerd. Se'et 13.00 di 'ereba cinaza hereket kerd, ver bi Berê Mêrdînî şî. Cinaza benî ki Gorîstanê Berê Mêrdînî di binimnî (defn bikî).

Şaro ki hamebi cinaza zaf zaf bi. Tanî vanî "100 000 (se hezar) mêrdim hamebi cinaza". 11 Temmûza 1991 di gazeteyanê Cumhuriyet, Milliyet û Sabah di nuştebi ki "Şaro ki şîbi cinaza Vedat Aydınî beyntarê 25 000 û 50 000'î di bî".

Ez bi xwi grûba verîni reydi nêbiya, ez tikê erey şîya. Wexto ki ez şîya, mi ra ver beyntarê polîsan û şarî di lej (de'wa) vejîyabi, barîkatî virazîyaybî; cûka mi nê-şîna ûver (aver) şêra.

Dim a wexto ki lajê mi hame, xeberî ardi, va: -Qereqolê Berê Mêrdînî di, Bedenê Diyarbekir ser ra tîmanê dewletî milleti ro adir billa kerd, tîfingî şarî ra nay. Milleti hewna zî xwi şaş nêkerd û dewam kerd, ver bi gorîstan şî.

Nimîtişê cinaza ra pey, wexto ki şar wazeno ageyro, tîmî û polîsî dor-marê jîni (yîni) gênî, nêverdanî ki ageyrî şarîstan. Ay wext zî tîfingan şarî ra nanî. Şar xwi kerran (siyan) reydi mudafe'a keno. Tanî mîrenî, birîndar benî; tanî zî şuş benî seracêr şonî û xelisênî. Hetta Berê Mêrdînî di yew cawo berz esto, tanî xwi weyre ra erzenî war, mîrenî yan zî seqet benî. Ayê ki remenî û zeftê polîsan û tîman ra vejîyênî, helîkopterî jîni taqîb kenî, pîro adir billa kenî, bomba mijî (sis bombast) erzenî jîni ser. Hetanî se'et 23-24 panayîşê tîfingan û dabançan dewam keno. Ambulansî birîndaran benî xestexane labrê tîmî û polîsî doktoran zî kwenî, nêverdanî ki birînanê birîndaran daru bikî.

Milleti ra 4000 ten xwi ancedo dewa Ka'bê (Bağîvar), ti ra tanî zî birîndar î. Dewa Ka'bê, Diyar-

Dewamê ci riperê 9.

FAL

BERAN (21. 3 - 20. 4)



Baqil vînde, karê xo **pak** bike. Çixirê zimîstanî de kutûkû ra xo biseveke. Sîlecenîya to esta.

MOZİK (21. 4 - 20. 5)



Kêf kêfê tu yo, dewran dewranê tu yo. Bûre, bişime, bifeteliye. Na roca niyanêne reyna nivînena. To rê nejdî ra çiyêna yeno.

DİLETÎ (21. 5 - 20. 6)



Talê to nêgurîno. Ti kotî ra şêrê delviçe perena. Xo rê miyaze poce, qirvane bike, vengay Wayîrê xo de. Beka to rê cayê ra roste keno ra.

KERKENCE (21. 6 - 20. 7)



To hewnê xo dîyo. Rastê juya sipe-laye, sithelale yena. A kî to rê jê çîla Yeynîye veşena. Rehetîya to hurendî der a.

ŞÊR (21. 7 - 20. 8)



Xaxê to tenê dezenê, so germikû. Rind qayitê xo ke. Osû reyê yeno dîna. Qurvetîye de weşî ya.

AZEBE (21. 8 - 20. 9)



Halvozûnê xo rê xayînenî meke. Berz ra meso, alçax kuna. Zovî kî talê to gure-yeno. Gegene Waxt biwane.

QENTER (21. 9 - 20. 10)



Yê xuyanê xiravîna ca verde. Waxt nika xiravîna o, danê to ro, lew û pîrnûkanê to kenê wele. Meşermayîye, a kî to ra hes kena.

DİMPISTİKE (21. 10 - 20. 11)



Na rozû cayê ra tenê perey kunê to dest. Çar-çur meke. Pê kar û gurê xo bike. Tenga to esta.

TÛRKEMAN (21. 11 - 20. 12)



Sar to nêwazeno, to de qarîno. Xo teng meke. Oncîya çî zonenâ henî bike. Xo biseveke. Verê to hîratî ya.

KELEZE (21. 12 - 20. 1)



Kar û gurê xo de niyadê, cenî û domonû ra hes bikerê, dedîqûdî zerê çeyî mekerê, fîstansurû dime niya mederê, hal û waxt rind o.

BIROS (21. 1 - 20. 2)



Henî poştî ser meredîya ra, çî tur mird bûrê? Kam to rê gîan do? Xo awe û adir ra biseveke.

MOSE (21. 2 - 20. 3)



Dengiz eve kunêz kême nêbeno. Hal û waxtê to rind o. Ti ke ju de ardim bikerê, tawa ve to nêbeno. Çimtengîye meke. Xo jêde meqefelne*.

FERHENGEKÊ KELÎMANÊ DÊRSİMÎ

ardim kerdene: yardım kerdış
awe: aw, awki
azebe: 'ezebi, nêzewiciyaya
baqil: bi aqil, aqil
beka: beno kî, belkî, belkiya
biros: sitil, satil, helke, hilke
çeye (çeyê): keye
çimtengîye: çimtengey
çi tur: çî tewir, senî, senêwa?
de: di, dir, der
der: dir, de, di
dengiz: derya, deyra
dezayîne: dejayîş, tewayîş
dime: dima
dimpistike: demaşkul, demaskul, aqreb
domon: doman, gede, qeç, qij, tut, 'eyel, kulfet
eve: ebi, be, bi, ve
feteliyayene: gêrayîş, geyrayîş
fîstansure: fîstansure, kesa kî fîstanê ya sur o (cenî, keyneki)
gegene: gegane, ge ge, gilangan, ra-ray
germik: hemam
gîan dayene: can dayene, qezenc kerdîş
gure: girwe
halvoz: olvez, heval, hembaz, embaz, enbaz, imbaz, 'emaz, 'imaz
henî: winî, ay hewa, ayawa, awa
hîratî: herayey
hurendî: herindî, ca

jê: zê, sey, sê, hezê
jêde: zaf, zav, zêde, bol, vêşî
ju: yew, yow, yo, jû, zu, zû
keleze: kelje, kelje, kelce, kel
kerkence: kirkinci
kême: kemî
kî: zî, jî
kotî: kure, kura, ça, sera?
kunêz: kundêz, kewndêz, kowndêz, kondêz
miyaze: niyaze
mose: mase, masa
mozik: viştira
nejdî: nizdî, nuzdî
nika: anika, enka, inka, inkey
niyadayene: nadayîne, ewnîyayîş, ewniyayîş, hewniyayîş, howneyîş, owneyîş
niyanêne: winasî, ansî, enasar, inasar, onasar, ena dusi, ina disî, ina cusî
oncîya: oncî, onca, oncîna, ancî, ancîya, ancîna, hewna, rayna, reyna, fina, gilana
osû: mêrdim, insan, inson
pak: park, ponk
pê: pey, bi, ebi, eve
pîrnûk: pîrniki
poştî: paştî
qayit kerdene: weye kerdîş, miqayt kerdîş, qayta kerdîş
qefelnayîne: betilnayîş, 'eciznayîş

Dewamê ci riperê 9.

Ji Qazaxîstanê nameyek:

"Me ji Gorbaçov xwest ku rê bide me, em li dij Saddam şer bikin"

Çendekî berê li bajarê Cambûlê li dijî rejîma Seddam Huseyîn mîtingek pêk hat. Xên ji bajarê Cambûlê, Kurdên bajarê Çimkendê jî tevî mîtingê bûn. Xebatkarên amadekirina mîtingê Bedirê Mûsa, Seyîdê Misto, Şêx Mihemed, Huseyînê Bala - ji bajarê Çûê- Xambabayê Ehmed - ji bajarê Xaratûê-, Mişîrê Yûnis - ji bajarê Çimkendê- bûn. Di mîtingê de dayika Senem jî peyivî. Xebatkarên mîtingê telgrafek ji serokkomarê Qazaxîstanê N. Nazarbayev re şandin ku alîkariya Kurdên multecî yên Kurdistanê Başûr bike. Li bajarê Cambolê ji bo alîkariya Kurdên Iraqê hesabekî bankayê hat vekirin. Reqemê hesabê alîkariyê ev e: 002700504. Navê Bankayê Jilsosbank, li bajarê Cambolê. Heta van rojên dawî ji gundên ku Kurd lê dijîn 52 hezar rûble wek alîkarî ji Kurdên multecî re hatiye civandin.

Her weha li ser qirkirina Kurdan li

Îraqê me çend cara telgraf ji serokkomarê Sovyetê Mixayîl Gorbaçov re şandin. Dîsan me bi telgrafekê xwest ku rê bidin me, em biçin Kurdistanê Başûr û mil bi milê birayên xwe yên Kurd re li dijî rejîma Seddam Huseyîn şer bikin. Lê hukûmeta Sovyetê xwe li ser daxwazên me kerr kiriye û heta niha jî bêdeng e.

Em Kurdên li Sovyetîstanê dixwazin xebatên xwe di gel xebatên birayên xwe yên li her çar perçan bigihînin hev heta ku li her çar perçên Kurdistanê ala me ya rengîn pêl bide.

Qurbanaliyê Ilyaz

Qurbanaliyê Ilyaz endamê Yekitiya Rojnamevanên Yekitiya Sovyet e û her weha redaktorê rûpela 'Sibe' ye ku li Qazaxîstanê derdikeve.

X a ç e p i r s

Amadekar: S. Rêving

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1												
2												
3												
4												
5												
6												
7												
8												
9												
10												
11												
12												

Çeperast: 1.a- Kesê ku karê wî nêçir be, seyidvan. b- organeke laşê mirov ku pê dibihîse. 1.a- Navê organeke laş (bervajî) b- Bîna 3.a- du herfên wek hev b- Ji navê mêran. c- Sembola enternasyonal ya Number-numara. 4.a- Kaînat. b- Heywanekî avî û bejî. 5.a-Di Kurmancî de daçekek (bervajî) b- Navê qezayekê Diyarbekirê. c- ne ronahî. 6.a- Du herfên bêdeng b- Baneşanek (bervajî) 7.a- Sînonîmeke hejmarekê b- Gurîya agir, pê. 8.a- Helbestvanê klasîk ê Kurd ku li gor gotin û galgalan li hespekî boz suwar dibû û pûşîyê reş dida serê xwe. Heta niha li ser jiyana wî melûmatên tekûz peyda nebûne. Lê hin helbestên wî hene. 9.a- Navê qezayekê Hekarîyê ku dikeve

ser sînorê Kurdistanê Başûr (bervajî) b- navê kin ya Partiya ku niha li Tirkîyê li ser hukûm e. c- Di Kurmancî de pronavekî kesîn. 10.a- Bi soranî 'av' (bervajî) b- Deştik, yan rastgehên li ser kopên çîyan. 11.a- Di Kurmancî de peyveke pevgerîdanê b- ne şil, ne ter (bervajî) c- Halletê emir ji lêkera 'Rabûn' 12.a- Kesê terefîdar, tagir.

Bersîva Hejmara 115'an

Çeperast: 1.a-bedew, b-berhem. 2.a-îlon b-se, c-nê. 3.a-fe, b-vîl. 4.a-semawer, b-dîba. 5.a-adar, b-rabe. 6.a-Remezhan, b-erê. 7.a-ziqbûn, b-îc. 8.a-sîxur, b-sîxur. 9.a-aye, b-înrv, c-ûz. 10.a-sal, b-ne, c-fit. 11.a-otak, b-bî, c-şwer. 12.a-têli, b-eke.

Serejêr: 1.a-bîrsar, b-Sason. 2.a-el, b-edebîyat. 3.a-dotmam, b-xelat. 4.a-en, b-arezû, c-kê. 5.a-aw, b-zîrîn. 6.a-eraq, b-nebî. 7.bef-ranber. 8.a-ûrif. 9.a-rn, b-de, c-nîvişk. 10.a-hêvî, b-twe. 11.a-ib, b-rî. 12-Melayê Cizîrî

Serejêr:

1.a- Navê kûlîlekê b- Şemsiye. 2.a- Bincilek, ji kincên binî (bervajî) b- Dawet, şahiya ku ji bo zewaca xort û qîzekê tê kirin. 3.a- Navê pêxemberekî (bervajî) b- peyva pevgerîdanê ku yek herf e. 4.a- Hêz û daxwaza kirinê, vîn. b- Proposition, edat. 5.a- Berhemê mêşhungan, hingivîn (bervajî) b- kesê kamûran. 6.a- Varyantek 'raser' ku li Behdînan bi kar tê (bervajî). b- Paşil, bersîng 7.a- Navê jina Hitler (bervajî) b- ne tarî, her weha navê kovareke kurdî ku di salê 1940 î de derketiye. 8.a- Dengvedan (bervajî) b- Li hinek deveran ji 'Birek' ê re tê gotin. 9.a- Sembola navnetewî ya Tirkîyê (bervajî) b- Gep, pirtê nan. 10.a- Tev, hemû, giş b- Dadî, jina ku şûna dayikê li zarok dinêre. c- Hêt, beşek ji laşê mirov (bervajî) 11.a- Hukûmdarekî Imparatoriya Roma ku bi zalimbûna xwe bi nav û deng bû 12.a- Eşîrek e ku li sê perçên Kurdistanê; li Kurdistanê îranê, îraqê û Tirkîyê dijî. b- sebeb, eger.

Dûmahîka nivîsan

Li Tirkîyê hilbijartina giştî

salekê beriya wexta xwe, di 20'ê Çirîya Pêşîn de wê çê bibe.

Lê di vê hilbijartinê de partiya ku rengekurd e, HEP wê nikaribe beşdar bibe. Partiya li ser hukûm û ew her du partiyên muxalefetê ku di parlamentoyê de temsîl dibin bi biryareke musterek bi bahana hin formalîteya, pêşî li HEP'ê girtin ku di hilbijartinê de beşdar nebe. Li ser vê yekê HEP'ê jî bi SHP rê li gor hinekan "itifaq" kir, li gor hinekan jî îltihaq kir. Lê tiştê ku diyar bû di lista SHP'ê de di navbera 10-15 namzetên HEP'ê ku şansê qezenckirina wan zêde ye, hene. Parlamenterên HEP'ê jî bo di listeya SHP'ê de bikaribin têkevin hilbijartinê ji HEP'ê istifa kirin. Îtifaqa bi SHP'ê re dubendî kir navbera HEP'ê. Qismek ji serkirdayetîya HEP'ê û hin rêxistinên wê bi şidet li hember wê itifaqê derketin û dan

diyar kirin ku wê di hilbijartinan de namzetên serbixwe derxin.

Di listeyên SHP'ê de li herêma yekem a Diyarbekir serokê HEP'ê Fehmî Işıklar di serê listeyê de ye. Di herêma duyem de, yê yekem Salî Sumer e û ya duyem jî Leyla Zana ye. Li Mêrdînê serliste Ahmet Turk, li Batmanê Adnan Ekmen, li Şîrnaxê Mahmut Alinak, li Ruha herêma duyem jî Serhat Bucak e. Di listeya ANAP'ê ya bajarê Şîrnaxê, di dora du-duyan de Nurettin Yilmaz e û di dora sisîyan de Kemal Bîrlîk e.

Di haziriya hilbijartinê de tiştê herî balkêş di nav Partiya Refahê de qewimî. Partiya Refahê jî bo hilbijartinê bi partiya faşîst a Turkeş MÇP û bi partiyek biçûk IDP'ê re li hev kir. Li hember wê itifaqê reaksiyona pêşî ji namzetê Partiya Refahê yê Şîrnaxê û wezîrê ke-

vin Şerafetîn Elçî hat. Şerafetîn Elçî got ez namzetiya xwe di partiyek ku bi dijminê gelê Kurd re itifaq dike -mebest partiya Turkeş e-, danayim. Piştî pêkhatina wê itifaqê, gelek rêxistinên Partiya Refahê yê Kurdistanê wek Cizîr, Diyarbekir, Batman, Şîrnax, Sêrt, itifaq protesto kirin û ji partiyê veqetiyên. Van rêxistinên beyan kirin ku wê di rojên pêş de ji bo partiyek îslamî û Kurd şûrayekê bicivînin. Herwisa wan da xuyakirin ku li dij itifaqa HEP û SHP'ê ne jî û van itifaqên han bi planên dewletê yê li dijî gelê Kurd ve girêdan.

Ji alî din ve hin hêz û platformên Kurd li Kurdistanê di haziriya derxistina hin namzetên serbixwe ne. Ji van yek, li Diyarbekir li herêma yekem namzetiya İbrahim Aksoy e.

Sîstem têkçû, yekîtî şik jê heye

dewletên Baltîkê bi resmî di civîna Ewlekarî û Hevkarîya Welatên Ewropayê de, ku çendekî berê li Moskovayê çêbû, hazir bûn.

Êdî êşkere bû ku piştî 70 salên sosyalîzma Yekitiya Sovyetê; bi temamî pîrsa millî û eqelîyetan çareser nebûye. Ji mîletên paşde mayî re dibistan vekirin, alfabeyê çêkirin ne bes e. Dijminatî di nav mîletan de dom dike, baweriya mîletan bi hev nayê. Gelek eqelîyet jî piştî ewqas sal hîn doza mafên xwe dikin. Ji bo ku mafê otonomiyê nedin gelê Kurd, li 9 komarên Sovyetê bi zanetî hatine belav kirin.

Welê xuyaye bi formulên nûh jî wê pîrsa komarên Sovyetê hel nebe. Kes nîzane wê yekitiya wan bi çî alî ve here. Yekitiya wan bi şik e.

Ne tenê pîrsa millî çareser

nebûye, her weha li Sovyetê sîstema sosyalîzmê ya 74 salan jî têk çû. Partiya Komunîst ku 74 sal e Sovyet îdare kiribû li gelek cumuriyetên Sovyetê hat qedexekirin. Heykelên damezîrînan Sovyetê Lenîn li gelek bajarên Sovyetê hat rakirin. Niha jî munaqeshe dibin ku mavzoleya Lenîn ji Meydana Sor bê rakirin û naşê wî bibin goristana wî ya malbatî. Bî vî hawî dixwazin dawîya sîstemê bin.

Rojname "Pravda" ku 79 sal e Organa Partiya Komunîst bû, bû rojnameyê serbixwe û dev ji slogana xwe ya "Karkerên hemû welatan yekbin!" jî berda.

Sekreterê Giştî yê Partiya Komunîst a Yekitiya Sovyetê M. Gorbaçov ji sekreteriyê îstîfa kir û pêşniyar kir ku partî belav bibe. Piştî darbeyê prestîja wî jî pîrr

ketiye. Ew bi xwe nuha ketiye bin emrê Yeltsîn. Yeltsîn çî dibêje, Gorbaçov tîne çîh. Him Gorbaçov û him jî Serokkomarê Rûsyayê Yeltsîn di hevpeyvîna xwe ya bi televîzyona Amerîkî ya ABC re êşkere gotin ku sosyalîzm li welatên wan îflas kiriye. Gorbaçov bi kûrtî wiha digot: "Modela ku me bikaranî bi ser neket. Di wê baweriyê de me ku ev biserneketina tenê ne ji bo me, ji bo herkesî wê bibe ders".

Yeltsîn jî hîn êşkere digot ku: "Komunîzm li gel xweşbûna xwe fikreke utopîk e. Tercûbên ku em dijîn, trajediya dawî ya îdeala xweşbûnê ne."

Sîstema sosyalîst a ku heta nuha alternatîfa kapitalîzmê bû li dijê wê bi ser neket. Lê heta neheqî, ked-xurî û zulûm li dinyayê hebe wê fikrên sosyalîmê jî her hebe.

"Tiyatroya Kurdî ji bo min vatiniyek e..."

tune. Hêviya me ji alî xurtkirina danû-stendîne ve îro gelek e. Em dixwazin çûyîn û hatina me zêde be. Em dixwazin ku mecal bêtin afirandin ku tiyatroya me derkeve derê Sovyetê ku mîletê me yê derê Sovyetê jî tiyatroya Kurdî temaşe bike. Bî wê yekê jî kêmasiyên ku min li jor anîn zimên dê kêr bibin, ka-

dir ji me re derkevin, nivîskar ji me re binivîsin. Çûn û hatin, danûstendin ez bawer im ku wê viyanek (stîmulans) baş û bilind di nav tiyatroya ma de peyda bike.

Min divê Kurd li gelê xwe xwedî derkevin daku mîletên niha em di nav de dijîn bila bizanibin ku piştî me heye, em ne

bêxwedî ne. Ez jî bo vê fersenda ku kovara Armanc da me, dixwazim ji redaksiyona Armancê re spas, hezkirin û silavên xwe pêşkêş dikim. Rast e hun cara yekemî e ku di derheqê me de dinivîsin, lê em ji Armancê hez dikin.

Rojnama Kurdistan

(No:1, 1315=1898)

Rojnama pêşin a Kurdan; Kurdistan 93 sal berê, di 22'ê Nisana 1898'an de li Qahirê derket. Xwedî û berpîrsiyarê wê yê pêşin **Miqdat Midhet Bedirxan Beg** bû. Wî karibû tenê 5 hejmar derxistana, bi hejmara 6'an re birayê wî **Ebdurrehman Bedirxan Beg** dest pê kir û Kurdistan derxist. Heta îro tenê 31 hejmarên wê rojnamê hatine tesbît kirin. Hejmara 31'an jî di 1902'an de li Cenevrê derketiye. Hejmarên wê yên pêşin bi Kurdî, pişt re bi Kurdî û Tirkî (Osmanî) derketine (1).

Li jêr em transkripsiyona ji herfên 'Erebî ya hejmara pêşin (no:1/1898) a rojnama Kurdistan pêşkêş dikin daku xwendekar bikaribin Kurmanciya nivîskî ya sedsala berê û ya îroyîn bidin ber hev.

Mahmûd Lewendî

Bismillâhîrrehmanîrrehîm
 Sed hezar şûkr û hemd ji Xudê te'ala re em musulman xulq kirin û zanîna 'ilm û m'erîfetîyê re hiş û zeka da me. Derheqa 'elimandîna 'ilm û m'erîfetîyê re gelek ayetên celfîle û ehadîsî şerîfe henin.

Dinyayê de çiqas musulman hebin, gund û bajêrên hemiya de mekteb û medrese û cerîde henin. Dinyayê de çî dibe çî nabe cerîde dinivîsin. Heyfa min têt ji Kurda re, Kurd ji gelek qewma zêdetir xweyî hiş û zeka ne, di binyên xwe de rast û qewî ne, xurt in û dîsa weke qewmên dî ne xwenda ne, ne dewlemend in.

Dinyayê de çî dibe, cîranê wan Musqof çawa ye, wê çî bike, nizanin. Loma riya xudê de min ev cerîdeya ha nivîsî. Bi izna Xudê

te'alî paş niho her pazde roja de carekê ezê cerîdekê binivîsim. Navê wê min kirîye **Kurdistan**. Vê cerîdeyê de ezê behsa qencîya 'ilm û m'erîfeta bikim, li kuderê mirov di'elime, li kuderê medrese û mektebên qenc hene ezê nişa we Kurda bikim. Li kuderê çî şer dibe, dewletên mezin çî dikin, çawa şer dikin, tîcarêt çawa dibe, ezê hemiya hikât bikim.

Heta niho kesî cerîdekî hulê nenivîsiye, ev cerîdeya mina ha ya 'ewilî ye, loma wê gelek kêmayî hebitin. Ez hîvî dikim kêmayî cerîdeyê ji min re binivîsin. Hemî tişt wekî nû çê dibin kêmin in, paşî hinekî (?) diçe (?), dikeve rê de (*), eve êdî ezê dest meqsedê bikim.

"We mîn ullah el tewfiq"

Hezretî Pêxember 'eleyhî es-selat wesselam gotîye: "el 'ullema wereset ul enbiya", ango ulema warisên enbiya ne. Ji teref Xudê de mamûr in, we'z û nesihetê bidin xelkê, riya qenc nişa wan bikin, loma gelî ulemayên kurda çawa win(hun) we'z û nesiheta nimêjê didin, welê divê win mîr û axa û Kurmancên dinasin wan teşwîqa zanîna ilm û ma'rîfetê bikin. Riya qenc nişa wan bikin. Heke win we(weha) nekin, gunehê hemiya stuwê we ye.

Dîsa Hezretî Pêxember 'eleyhî es-salam gotîye: "el 'ilm, 'ilman, 'ilm ul 'ebdan we 'ilm ul 'edyan", ango 'ilm dudu ne; yek jê 'ilmê bedenê, yek jî 'ilmê dîn û îmanê ye, 'ilmê bedena hekîmî ye.

Gelî mîr û axano, heta niho yekî ji we guh daye vî emrê pêxember, kê ji we zaroyên xwe, birayên xwe, mirovên xwe rêkirine dane xwendin, kê ji we gundê xwe de, bajêrê xwe de mekteb, medreseyek daye çêkirin?

Gelî 'ulemano, win çîre wan hedîsa ji mîr û axa re naxwînin, win çîre cerîdeyên 'erebî naxwînin da win bizanînin dinyayê da çî dibe.

Dîsa Hezretî Pêxember 'eleyhî selam gotîye: "el kasîbû hebîbullah", ango mirovê kesb û karî bike, Xudê ta'ala hej wan dike. Ew mirovê ne xwenda be, nizane cerîdeya bixwîne. Ew mirovê cerîdeya nexwîne, nizane li kuderê tîcarêt qenc dibe. Cerîdeyên niho tîn nivîsandin behsa hemî tiştan dikin. Mirovên wan bixwînin wê bizanibe malê destê wî de, li kuderê pera dike.

Van salên ha de Istenbolê mektebek hatiye çêkirin. Navê wê mektebê **Mekteba 'Eşîra** ye, xeyr zaroyên 'eşîra, zaroyên kesî qebûlî nakin. Ji Bexda û Şamê, ji Yemenê, Şimr û Enzê, He-mayê zaroyên xwe rêdîkin Istenbolê vê Mekteba 'Eşîra de dixwînin. Her sal du heyva diçin malên xwe, paşî dîsa tîn. Şêş heft sala de 'alimên qenc ji wan derdikevin, paşî ewên diçin gund û bajêrên xwe, dewlet her heyv pera

dide wan, dibin mamûr, hêdî hêdî dibin muteserrîf, dibin walî.

Gelî mîr û axano, gunehê zaroyên we wê stuwê we be. Win jî zaroyên xwe rêkin bidin xwendinê, dewlemendên we bila gunda de mekteba çêkin, riya xudê da xêra bikin.

Dîsa Hezretî Nebî 'eleyhîselam gotîye: "El herbû xud'et'ün." Gelî mîr û axa û Kurmancino, dunya zane Kurd camêr in, lê vî zemanê ha de şer bi camêriyê tenê nabitin, top û tîfingên we(welê) 'ecêb derketine, hewqa dîr diçin cihê mirov dengê wan nebihîst, guile û berikên wan diçin mirova diku-jin, cihên mirov jê wek teyra dixweyîyê, berikên wan tîfinga diçe di-kuje. Ev top û tîfingên ha bê mekteb û medrese mirov ne dikare çêke, ne di-kare bi'emîline. Loma bê van top û ti-finga cesûriya we wek mirovên dest-girêdayî ne.

Li Meshefa Şerîf de emir biye "Cahîdû fî sebîlullah", ango riya Xudê de şerî bikin, duşmînen dîn re cîhadê bikin. Duşmîne dîne we cîranê we Mus-qof e, heta niha Musqof gelek der zebt kirine, musulman file kirine, dor wê têt Kurdistanê. Heke we jî xwend û win 'elimîn tîcarêta û sen'eta, win dewlemend bibin winên bikaribin xwe ji şerê wî xelas bikin, heke we guh neda van nesihetên min, heke dîsa hun şivani û rêncberîyê tenê bikin, zema-nek hindik de Kurdistan wê yekcar xera bibe. Cîranê we 'Ecem jî berê wek Kurdan bî, vî zemanê paşî ewan jî qenc zanî, bê 'ilm û huner nabitin. 'Ecema gelek mekteb, medrese henin, ewladên xwe rêdîkin welatên dîr, di-din xwendinê. Niho ji jî begzadeyên 'Ecem sê-çarek Istenbolê li mekteba Herbiyeyê de ne.

Gelî mîr û axano, qenc fikirin dora xwe, win hingî diçe feqîr û kêmin dibin. Sebeb cahîliya we ye. Elhemdulillah gelek mekteb û medrese henin, riya xudê da zaroyên xwe rêkin bidin xwendinê, ji vî cahîliyê xilas bibin, dunya û axireta xwe me'mûr bikin.

Xelk dibêjin heke Kurd bixwînin wê ji 'alemê xurttir, dewlemendtir bibin.

Dîsa Hezretî nebî 'eleyhîselam go-tîye: "utlûbû el 'ilme welew kane fis-Sin", ango 'ilm Çînê bitin herin wêde-rê bixwazin, bi'elimîn. Gelî mîr û axano, ez ji we dipîrsim, kê ji we heta niho mi-rovêk xwe rêkirîye kuderê da bix-wînit. Elhemdulillah, Bexdayê, Şamê, Istenbolê mekteb û medreseyên hu-kumetê hene, bê mesref in, heçî ji we zaroyên xwe teslîmî hukumetê bikit, bê mesref wê rêkin bidin xwendin.

Berî du-sê sala dewleta Çîn û Japonyayê şer kirin. 'Eskerê Çînê deh cara ji 'eskerê Japonyayê zêde-tir bî, hemî şera de Japonyayê karî 'eskerê Çînê. Werin vî carê sebeba vî halî bipîrsin; Mirovên Çînî cahil in, mirovên Çînî tişkî nizanin, mirovên Çînî nizanin top û tîfingên vî zemanî bi'emî-lînin. 'Eskerê Japonyayê top û ti-fingên xwe ew xwe çêdikin, hemî dera re tîcarête, kesb û karî dikin, loma dewlemend in. Saya dewle-mendiya xwe, sîlehên kêmin zûka ji derên dîr kirin û xweş xweş şerên xwe kirin û karî duşmînen xwe. Niho hemî malên xwe rahet in. Kes nikare xwe bide ser wan.

Ez gelek dera geryame, niho jî li Misirê me. Hemî dera zaroyên Çerkez û Arnawud û 'Ereba dibî-nim, babên wan, birayên wan rê-dîkin mekteba didin xwendin. Li Misirê Camî'a Ezher de rastî hin Kurdên Sora hatim, hin ji Kerkukê ne, hin ji milê Silêmanîyê ne, hemî dixwînin. Ez tu cara li tu dera rastî mirovên Bota, Xerzan, Şerwan, Hekarîyan nehatime, tu mekteban rastî mirovên 'eşîretên Kurda nehatime. Ez çiqas rastî mirovên wan 'eşîra tîm, hemî jî rêncber in, jar û reben in, sen'e-tekî, hunerekî nizanin.

Berî şêş heyva ez ne sax bîm, loma wê zivistanê ez hatim Misi-rê. Misir biye bajêrek hewqas me-zin û xweş heta mirov nebîne mi-rov nikare bi wesfa wê bizanibe. Ez hêdî hêdî ketim nêv Misirîya de 'elimîm hal û sen'etên wan, kesb û karê wan.

Ev xelkên Misirê mirovên bê-zirav in, ne camêr in, lê gelek di-şuxulin, nawestî. Li kuderê

1998 1315

کوردستان

بسم الله الرحمن الرحيم

صد هزار شکر و حمد ز خدای تعالی در آن سالان
 کردن و وظایف علم و معارفه هوش و زکا دامه - در حقا
 دنیا علم و معارفه کمال آیتین جلله و احادیث شریفه
 دنیا به یقین حاصل آیتین کونیه و با ژیرین
 مکتب و مدرسه و جریده هفت دناییده چه دیه
 آیه جریده در تیسین - حیرانان تیت ز کرداره گسرد
 ن قوما زیده تر خوبی هوش و زکا - جامیرن دینین
 راست و قویته خورتن و دیسا و که قومیت دی
 رنده - در زمان دناییده چه دیه جیران وان موسقوف
 به وی که به طلب نوما دیبا خدیده من اف
 به نیسی - مبدل خدیف تیت نو هر زده

لکۆدزی مرووف د خه لکۆدزی مدرسه و مکتبێن قهت هت
 از ی نیشا کردا بک لکۆدزی چه شر دیه دولین مطن چ
 دکن چاره شر دکن تجارت چاره دیه از ی حیا حکمات
 بک حتی بو کسی جریده کی مولی نیشی به آف جریده
 مناها یا عولیه لوما وی کیک کبابی هین - از هینی برا
 کبابا جریده بی زمانه بنسین هینی نشت وکی نو چه دیه
 رکن نیشی هکی دیه د کوه ریده آفه ایدی آزی دسز
 مقصدی بک (ومن الله التوفیق)

حضرت پیغمبر علیه الصلوة والسلام کوئیه به والملا
 ورتة الاییه - اکو عنا وارثین انیابه - طرف خدیف
 سامورن وعظ و نیشی دین خلکی دیا فنج نیشا وار
 لکن ونا کی عین کردا چاره اون ونظ و نیشی
 نیشی ددن ون نیشی ون مبر ونا و کوم نیشی دناس

لکۆدزی مرووف د خه لکۆدزی مدرسه و مکتبێن قهت هت
 از ی نیشا کردا بک لکۆدزی چه شر دیه دولین مطن چ
 دکن چاره شر دکن تجارت چاره دیه از ی حیا حکمات
 بک حتی بو کسی جریده کی مولی نیشی به آف جریده
 مناها یا عولیه لوما وی کیک کبابی هین - از هینی برا
 کبابا جریده بی زمانه بنسین هینی نشت وکی نو چه دیه
 رکن نیشی هکی دیه د کوه ریده آفه ایدی آزی دسز
 مقصدی بک (ومن الله التوفیق)

بسم الله الرحمن الرحيم

صد هزار شکر و حمد ز خدای تعالی در آن سالان
 کردن و وظایف علم و معارفه هوش و زکا دامه - در حقا
 دنیا علم و معارفه کمال آیتین جلله و احادیث شریفه
 دنیا به یقین حاصل آیتین کونیه و با ژیرین
 مکتب و مدرسه و جریده هفت دناییده چه دیه
 آیه جریده در تیسین - حیرانان تیت ز کرداره گسرد
 ن قوما زیده تر خوبی هوش و زکا - جامیرن دینین
 راست و قویته خورتن و دیسا و که قومیت دی
 رنده - در زمان دناییده چه دیه جیران وان موسقوف
 به وی که به طلب نوما دیبا خدیده من اف
 به نیسی - مبدل خدیف تیت نو هر زده

Berga pêşî ya rojnama Kurdistan (Hejmar: 1, 22 Nisan 1898)

mekteb û medreseke qenc hebit nabêjin dîr û nêzik e, zaroyên xwe rêdîkin didin xwendin, di'eli-mînin sen'eta, di'elimînin hemî tišta. Niho nêva Misirê de ji xel-kê Misirê hewqas xwenda û 'alim hene, hewqas mirovên xweyî se-n'et û huner hene, gelek me'rezîyê bajêr ew xwe çêdikin. Nêv Misi-riya de mirov hene top û tîfinga çêdikin. Mirtov hene xaniyên pêncî mezal ava dikin. Nêv wan xweyî sen'eta de mirov hene rojê 50-60 Çerxiya distînin. Mal û xa-nîyê hemiya xweş in. Hemî xwe-yî xadim û xulam in û nêv wan de nexwendayê wan jî hene, lê hindik in.

Gelî mîr û axayê Kurmanca, ez ji we dipîrsim; ji xelkê Misirê çî kêmayî we heye? Kurd ji Mi-sirîya camêrtir in, hiş û aqilê wan zêdetir e, hemî alî(?) da Kurd ji Misirîya qencitir in. De vêca çira xelkê Misirê wê ji Kurda dewle-mendtir bin.

Li Misirê hin Kurmanc hene,

bihîstine ku ez hatime Misirê, hemî jî hatine zîyareta min, min halê hemiya pîrsî. Hemî jî derge-vanî û xulamîya Misirîya dikin, hemî jî bin minneta wan de ne. Hina jî bîedebe kirine ji cihê xwe derêxistine, jar û reben bîne. Heke xwenda bîna, heke destê wan de jî hunerek, sen'etek hebîya, hulê jar û reben nedibîn. Heyfa min têt ji dergevanîyê, ji xulamîyê pêve kêr tişkî nayên.

Gelî 'ulema û mîr û axayên Kurda, win hemî 'esl û neslê min dizanin. Ciddê min Hezretî Xalidê ibnî Welîd e (Raziyellâhû te'ala 'enhû), 'eşîra me Botan in, şuhreta nîsla me 'Ezîzan in. Ez riya Xudê de dixebitîm min ev cerîde çêkir. Vê riyê de ez gelek pera serf di-kim, zehmetî dikîşînim. Meqseda min qencîya Kurda ye. Win jî ji xêra Xudê re dest hilînin Kurdan bidin xwendin. Zaroyên xwe bi'e-limînin 'ilm û edebê, bi'elimînin

Dûmahîk r. 8

ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesen Mizgîn

◆ Li dinê Xaçepirsa herî mezin di Nisana sala 1987'an de Dusan Dozê Yu-goslavî çêkir. Xaçepirs 40 m. dirêj, 0,5 m fireh bû û tê de 15 349 gotin û 45 500 tîp hebûn.

◆ Du Amerîkanî Jim Purol û Mike Papa ji Livonia li Michigan herçiqas ne cizarekêş in jî di carekî de 135 cizarên bi filître xistine devê xwe.

◆ We dizanibû ku eger mirov perçên dinê û okyanûsan bigihandina hevûdu wê دنیا 2500 metre di bin avê de bima-na?

◆ Ji hêşinayîyan %75 zêdetir xwedî klorofil in ku rengê kesk dide wan. Di hêşinayîyên ku pelên bi rengên dîn hene de, klorofil bi maddeyên dîn veşar-tiye.

◆ Li esman, stêrka ku tîrêja xwe herî bi qewet e, siriyûs e. Ew ji dinê 90.000.000.000.000 kilometreyan dîr e.

◆ Dewleta ku cara yekemîn dardeki-rin ji holê rakir -di sala 1798'an de-Lixîngstayn e.

◆ Li dinê rezervên gaza tabû ku heya niha hatine ditin, nêzî 130 000 milyar m³ e. Ev gaz ciyê 800 milyar varîl petro-lê digre. Li dinê ji 1/3 gaza tabû ku tê derxistin li Yekîtiya Sovyetê ye û di salekê de navbera 200-300 milyar m³ tê derxistin.